

ROJANÛ

kovara huneri çandi û edebi



NAVEROK

Ji xwendevanan	3
Pirsa Kurdi di parlamentoya Danimarkayê da	5
Elî Xoco (Ramazan Adıguzel) û Huseyin Ali Akagunduz bî destê Apociyan hatin kuştin	8
Şair û Nûsri Kurd: Sîware	12
Ji nav edebiyata Kurdi ya klasiki	14
Pirsgirêka Kurdistan û pûçbûna siyaseta 60 salî	16
Çend nûçe ji Kurdistanê	20
Ji Zargotina me	22
Çend çarir	25
Jack London	26
Quncikê Zarokan	28
Bî kurti	30
Leyla Qasim	31

Qapax: Muhemmed Xalid

Sal: 8
Hejmar: 60

XWEDI : KOMKAR - Swêd
BERPIRSIYAR : Şeroyc BOTAN
NAVNIŞAN : Döbelngatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
HESAP NO : PG. 458980 - 0

UTGIVARE : *Svensk-Kurdiska*
Arbetar Föreningen
ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN
ADRESS : Döbelngatan 16 B
113 58 STOCKHOLM
TELEFON : 08 / 32 82 51
PG : 458980 - 0

Swêd

Camêr ê delal,
Çend pirtûkên M.Emin Bozarslan gihan destên min. Dî van pirtûkanda gava min gronek: "Hobû tuncbû, carki ji caran..." dît ya ku bavê min dî piçûkiya me da ji me ra digot hate bira min. Ez ji ji we ra dişinim ku bira wenda nebe.

"Cariki ji caran, rehme li dê û bavê godaran,
Dîrab ji êmedaran, drab ji malê mürdaran,
Avêt Cizira Botan, geriya xan bi xan,
Çû gora bavê xwedî û xwedan,
Xur û xurustan, payiz çû ma ziwistan,

Eskerki giran, çû ser pir a dudiran,
Emê hina nû, ji par ra, têkevin xax û baxê giran,
Dem demê heydar, şahê qe'ender,
Be'ktaşê He'ci Welî, deri vekin ez bêm hundur
Kalê me ji bavê me ra goti, bavê me ji me ra goti,
Em ji dibên, pê şeva xwe derbas dîkin,
Ne min diye (diti) ne hun bawer bîkin."

Gulan 22.1987

Bî silavên germin
Hevwelatiki we

Awustralya

Lî ser "HATIRATIM"

Hevalên Redaksiyona Roja Nû ra Birayên delal, min kovara we, ango "Roja Nû" stand. Xênc wê, ew deh hebên "Roja Nû" ku şandibûn ew ji gihan destên me û bi wana gelekî dîlşa bûm; zor spas.

Hevalên delal, bî rasti hûn ji bo bêje a Kurd û Kurdistan xebatên gelek hêja tinin cih, ez we bî dil û can piroz dîkim. Lî nav van xebatên we da pirtûka Dr.N.Dersimi şûnek zor girîng distine. Ez dî vê nama xwe da dîxwazim çend tîştan lî ser pirtûka Dr.Nuri "HATIRATIM" bisekinim û çend şaşitiyên we rexne bîkim. Bî rasti ji bo xwendevanan van şaşitiyana girîng in. Eger van şaşitiyana ku yê we ne, ango yê çapxanê, bî kerema xwe çapa duduyan da van şaşitiyan serast bîkin. Na ku yê Dr.Nuri'ne wê çaxê dîsa ez dîxwazim hûn van şaşitiyan serastkî.



Şaşitiya yekemin- Dr.Nuri dibê ku ocaxê Bamansûr lî Pilemori gundê "Tahdi" û gundê Gersinonê aaye. Belê, lî pilemorê kesên Bamansûr hene, ez bî xwe ji tev seyidên gundê me "Kûpık" lî wan bûme mēvan. "Koçek yan ji Qamber". Ew efsana ku ji bo Mansûr derxistine û gotine Mansûr diwan ajotiyê, ew gunda, Moxîndiye. Moxîndi iro bî destê dijminan nav hatiye guhêrandin "Darikent". Lî dema qetliama Dersim da, serokê eşira Bamansûr Seyit Silêmanê kurê Seyit Bertêle lî gundê Lodekan. Seyit Silêman û bavê min lî hindirê

xaniyekê da û lı zikê saleki da hatine dinê. Bavpirê mın mirovê (coleg) yê man bûye. Heya roja iro ji qeyda mın û malbata me lı gundê Lodekan e. Seyit Hesen kurê Seyit Silêman e û lı wi zemani da xort bûye. Ango ew bı xwe serokê eşirê nebûye, bavê wi Seyit Silêman serok bûye. Lı dû şerê Dersim da hukumeta Tirk malbata wan ji nefi kır, şandin wilayetê Bursa, qeza Mûdanya, nehiya Tirilyeyê. Heya iro ji newiyê Seyit Silêman kurê Piro Cafer lı Tirilyê rûdinê û gelek ji mal û milkê wan heye. Cafer hıqûqvan bû, anga hakim.

Malbata wan lı dû efa 1946'an da dageriyan gundê xwe Lodekan. Dı wi zemani da ez neh (9) salı bûm û mın û zarokên wan bı hevra dı dibistana gundê Şilkê da dixwend. Seyit Silêman, ez bawerım 67 da çû heqıya xwe û kurê wi Seyit Husên bû serokê eşirê. Mamafi dı şerê Dersim da bavê Seyit Husên-Seyit Silêman- kurê xwe şandibû mala Seyit Ali Rıza ku bı Tirkan ra şer meke. Lê Seyit Ali Rıza ew sıktır kırıbû û şıva şandibû. Seyit Husên bı xwe van tıştan ji me ra got. Ew bı xwe ji dostê İsmetê Ker û mitê bû. A. Taş ew baş daye naskırın.

Ango gotına mın, diwarê Bamanşûr lı Moxındiyê ye, ne ku Pilemoriyê; û serokê eşira Bamansûran iro ji newiyê Seyit Bertêl in û lı Moxındiyê ne.

A duwemin- Dr. Nuri nivisandiyê ku serokê eşira Şadiyan Weli Xaki ye. Va ji şaşitiyek zır mezine. Weli Xaki kurê Mele Ūsuvê Hêmed, gundê Riçikê, serokê eşira İzola ne. Serokê eşira Şadiyan Resûl Axayê Oxiyê ye ne ku Weli Xaki. Mele Ūsuv nas û dostê dijminan

bû. Wi dı qetliama filan da (Ermeni) ji Tirkan ra pır alikari kırıbû. Ji bo wê alikariyê ji hukumeta Mıstê Kor gundeki filan nav Ertixan dabû Mele Ūsuv û navê kurê wi Weli ji, danibû Weli Xaki. Mıstê Pincê û kor, bûbû mēvanê wan û Heşım Begê Paliyê. Ango gotına mın, Weli Xaki serokê eşira İzola ne û meriyê xalê mın e. Xalê mın ji meriyê mala Hêmedena ne. Jê ra Ezizê Qiyê Alê digotin. Pıranıyan ji, jê ra Ezizê Ool dıgotın. Lewra desteki wi tune bû. Dinamit lı dest da teqiyabû. Ez bawerım Heval K. Burkay van tıştan baş dızani. Zira Kemal qasi mın lı nav Seyidan da nemaye ema ez bawerım lēgerinên wi pır pırın.

Ez hêvidarım hûn ji bo çapa du-duyan van şaşitiyan serastkın.

Ez bı dıl û can xebatên we pıroz dıkım, saxi û sılametiya we dixwazım û ji we hemûyan ra sılavên xwe yên şoreşgeri û kurdperweri rêdıkım.

Bırayê we
Rıza Çolpan

Hevalê Rıza,

Berya her tışti, em gelek spas dıkın ku xwendevanên me lı ser dirok û berhemên kurdi xwe diêşın û bı awaki rexnegri lı van berheman hür dibın.

Hevalê delal,

Te dı nama xwe da, lı gor xwe hınê "xetiyân" tesbit kırıye û ji me pırsê diki, gelo van xetiyân, xetiyên çapê ne yan yên Dr. N. Dersimi ne?

Bı rasti, dı derheqa rasti yan nerastiya van xetiyân da em nıkarın tışkeki eseyi bêjun, lewra dı destê me da agahdariyek tune. Lê, wek Weşanxana Roja Nû bersiva me ev e, ku "van xetiyân" ne yê çapê ne û pirtûk wek orijinalita xwe hatiye nivisandin û çapkırın.

Disan ji, em gelek spas dıkın ku te dı vi wari da bala me kışand.

WEŞANÊN ROJA NÛ

DI PARLAMENTOYA DANIMARKAYÊ DA PIRSA KURDÎ

ELIXAN - Danimarka

Piştî êrişa dawiyê ya rejîma faşîst a Tirk bi-re ser erdê Kurdistanê Iraqê, li Kopenhagê gelek parti, rêxistin û gurûbên Kurdistanê Tirkîyê, Kurdistanê Iraqê û Îranê bi hevra daxuyaniyên protestoyê pêk anin. Piştî ku van protestoyên han di gelek rojnameyan da cih girt û deng da, Partiya Sosyalist ya Gel û Partiya Çepên Sosyalist, di roja 18.3.1987'an da pîrsa Kurdî bîrîn parlamentoyê, derbarî vê pîrsê da ji Wezirê Derva pîrskirin û munaqêşe kirin.

Mebûsê Partiya Sosyalist a Gel Pelle Voigt û ji Partiya Çepên Sosyalist Albrechtsen, pêşiyê çend pîrs spartine Wezirê Derva Ellemann Jensen û dûra li ser bersivên wî ditnên xwe gotin û şîrove kirin.

Pelle Voigt: Gelo Danimarka wê ji vir şunda mafên netewî yên Kurdên li Danimarkayê nas bike? Wek: Kurdên li vir di kaxez û belgeyên resmî da wek Kurd bîrîn qeyidkirin; mafê perwerdegariyê bî zîmanê dê wê bête qebûlkirin?

Gelê Kurd, yek ji wan gelan e ku di dîrokê da, li ser wan delîlên nîvisandî yên herî kevin hene. Kurd xwediyê çand û zîmanekî hezar salî ne. Ew xwediyê wê qedera dîroki ne ku welatê

wan li ser gola petrolê ye û xwediyê stratejiyê-ke gelekî grîng e. Ji ber vê yekê ye ku ev çend sal in ew di navbera welatên Rojhîlata Navîn û hêzên super da bûye pîrsgirêk.

Kurdistan, iro di navbera çend welatan da hatiye parvekirin. Em dîzanan weki Wezir û Danimarka heta niha nexwestine ku di doza netewî ya gelê Kurd da angaje bibîrîn.

Li hember hemû hêvî û daxwaziyên me, Danimarka li dîji bombebaranên Tirkîyê li ser gundên Kurdan li Iraqê protesto nekîr. Em bî vî tîştî hayedar in. Lê iro li vir, bona Kurdên li Danimarkayê, dîxwaze hebûna wan ya netewî û zîmanê wan bînase û zordestiya netewî li ser wan rake yan na?

Wezirê Derva Ellemann Jensen: Berêz

Pelle Voigt du pîrs sparte min. Ya pêşîn, li Danimarkayê qeyidkirina wana wek Kurd. Ji vê pîrsê ra bersiva min ev e: Em, li Danimarkayê kesan li gor koka wan ya etnik qeyid nakin. Pîrsa duwemin ji ev bû: Gelo zarokên Kurd li vir wê perwerdegariya zîmanê dê bigrin yan na? Ez zêde têkîli warê Wezirê Perwerdegariyê nebim, lê bî kurtî dikarim bêjim: Di derbarî hêjandina (bî qîmetkirin) zîmanê vala da qanûn heye, ku

ji bo perwerdegariya bî zîmanê dê ji mecalê dîde. Ev tişt ji bo kurdi ji derbaz dibe. Ev ji tê wê manê ku pêwîst e hin şertên qanûnî bî cih bîn û kêmasî navên 12 kesan dî kursê da qeyidkirî bîn. Lê dî dibistanên geli da xwendîna zîmanê dê ji bo biyaniyan, ez we hewaleyi bersiva Wezirê Perwerdegariyê, berêz Bernard Baungsgaard dikim ku roja 12'ê Kanûna Pêşîn 1986'an da, li ser vê babetê bersiv dabû.

Pelle Voigt: Ez spasi wezir dikim ji bo bersiva wi ya kurt û ne ewqas vekirî. Dema Wezir dibêje ku tu kes li gor koka xwe ya etnikî nayê qeyidkirin, gelo dîxwaze bêje ku dî praktîka tîka Danîmarkayê da, daxwaza Kurdan ji bo ku dî cuzdan û kaxezên wan da - yên ku merciyên resmî didîne wan- dî şûna Tirk, Îran, Iraq da Kurd bê nîvîsandin, ev tişt ne mumkun e?

Ma Wezir pê nîzane ku gelek ji wan mîhacîrên ku em wan wek Tirk westî dikin, Kurd in, pîraniya wan tirkî baş fam nakin? Wezir mina ku xwe li nezaniyê davêje, naxwaze rastiye bîbine.

Ji bo zarokên Kurdan, perwerdegariya zîmanê dê tenê perwerdegariya zîmanê tirkî ye. Çimki li Tirkîyê, zîmanê Kurdan bî qanûna esasi hatiye qedexekirin. Gelo Wezir maqûl dibîne ku Danîmarka ji dî vê zordestiya netewî û dî vê tedayê da beşdar be? Ji bo çî, ma pêwîst e Danîmarka dî vê zordestiyê da beşdar be? Dibe ku meqamên Tirk, yên ku xwendîna zîmanê Kurdi qedexe dikim û ji multeciyên Kurd ra mafê programa radyoyê naxwazin, li Danîmarkayê zorê dikin?

Albrechtsen : Ez dîxwazim ji Wezir bîpîrsim, gelo inkarkirina mîletê Kurd, dî rastiye da nayê wê manê ku ev herweha tîkîlbûna îşên hundurî yên Tirkîyê ye û piştgiriye dîde Generalên Tirk? Çimki ev piştgiriye ji bo kiryarên generalan ku dîxwazim doza gelê Kurd bavêjin bîn cilê, ji ber çavan dîr bîxîm. Madem li ser pîrsa ku berêz Pelle Voigt gava dîn bahs kir, bala hukumetê hatiye kîşandin, dî vi wari da hukumet dîxwaze çî bike? Gelo hukumet ji bo rawestandîna terora li dijî gelê Kurd û li dijî generalên Tirk, dîxwaze gavên berbiçav bavêje?

Wezirê Derva Ellemann Jensen: Ez tê nagijim çima berêz Pelle Voigt bersiva min vekirî nabîne. Bî rasti ji bersivêk êdî ewqas vekirî dibe. Berê pêwîst e ez disan binê wan gotinên

xwe çîxêz bikim: Em, kesan li gor koka wan ya etnikî qeyid nakin. Eger berêz Pelle Voigt disan li ser bîfîkîre, ez bawer dikim wê rastiye bîbine, eger em destpê bikin mîrovana li gor koka wan ya etnikî qeyid bikin, wê çaxê hin perspektîvên nû û xeter wê peyda bîbin. Loma ez hêvî dikim ku ew disan li ser vê pîrsê bêtir bîfîkîre. Herweha ez li dijî wê qîseyê me ku Danîmarka ji dî zordestiya netewî da beşdar dibe. Li ser îmkânên perwerdegariya zîmanê Kurdi, min dîr û dirêj şîrove kir.

Li ser îddîa berêz Albrechtsen ji, ku dibêje em li vir tîkîlî îşê hundurê welatekî dîn dibîm, ez dîxwazim vi tiştî bêjim: Ew siyaseta naskirîne ya ku em li dîr dîçîn -ku hukumetê beriya me ji li ser vê rêçê çûne- tenê li ser bîngehê nasîna dewletan e, û ji ber vê yekê ji, nasîna hûrgelên etnikî û hukumetan, ne babetê qîsekirîne ye. Û berêz Albrechtsen piştîra bî gîştî behsa pîrsgirêka kurdi dîke. Pêwîst e em ji berêz Albrechtsen ra bêjin ku doza kurdi, pîrsgirêkeke gelekî tevlihev e. Li wê navçê, car-caran çî bî destê Kurdan, çî ji li dijî Kurdan gelek zulmet û xûn-xwari hatiye kirin. Bêyi ku em li navçê rêyeke çarelêkirîne dikte bikin, pêwîst e em çawa li herderê wîsa ji li vir, bî riya aşîtiyê çarelêkirîne daxwaz bikin. Van demên dawiyê, bûyer û kiryarên ku hem ji aliyê Tirkan va, hem ji aliyê Kurdan va dîqewîmîn, dîdîm xuyan ku pîrsgirêka kurdi çîqas tevlihev û bî hevîkîyan va tîji ye. Diyar e ku ev yek, ji vê pîrsgirêkê ra, dîtîna hellekî bî awakî harmonîk, gelekî dijwar û zehmet dîke.

Pelle Voigt: Pêwîst e ez îtiraf bikim ku dijayeti her dîçe fîretîr dibe. Qasî ku ez fam dikim, cedandîna tunekirîna netewaya Kurd, wê neyê protestokirin. Danîmarka heta li ser cuzdan û kaxezên ku li vir dîdîm Kurdan ji, hebûna netewaya Kurd ya: ji tiştêkî wîsa nas nake. Herçend ew (Kurd) bî xwe dîxwazim ku dî cuzdanê wan da mîlîiyeta wan bê nîvîsandin û diyarkirin, lê belê li ber bîryar û daxwaza Îranê, Tirkîyê, Iraqê û welatên dîn stû tê xwarkirin. Bî rasti tewrê wezir dî derbarî xwendîna zîmanê dê da, hînekî ez êşandim. Çimki em hemû ji pê dîzînanîna ku, her kê bîxwaze dikare dî Dibîstanên Êvarê da, alîkariyê wergire, heta dikare zîmanê esperanto, ido yan ji valapyk ji bîxwîne. Em vê dîzînanîna, lê pîrs ne ev e.

Tiştê ku em li vir dîxwazim bêjin ew e ku, li Danîmarkayê komeke mezin heye û dîxwaze dî

dibistanên gel da bî zimanê xwe yê dê dersê bigre, ne ku em wan mecbûri xwendina zimanên biyani bikin. Dema berê, ji sinorê Başûr gelek muhacir hatin Danimarkayê, eger wê çaxê ew derbasi nav Swêd bibûna û li wir, qisekirina zimanê Elmani, bî zorê li wan bihata sipartin, ma wê di cih da bûya? Ev herdu tişt ji min hev in. Ev rewşa han hiç maqûl nîne.

Albrechtsen: Pêwist e ez itiraf bikim ku ez heyret mam li ser bersiva Wezîr, ku min di derbarî terorê da ji wî pirs kiribû. Ez disan bini çixêz bikim û bîpîrsim: Gelo em ji bersiva Wezîr wisa fam bikin; weki êrişa hewayê ya ordiya Tirk ku bû sebêbê kuştina 800 kesên sivil, ku pîraniya wan jin û zarok bûn, tolgirtin tê qebûlkirin. Gelo Wezîr, ji ber ku ev pîrsgirêk ewqas tevlehev e -bî gotina wi- loma naxwaze tewîr bigre û li dîji vê bûyerê protestoya xwe diyar bike? Eger wisa be, wê çaxê ev yek dide xuyan ku Danimarka bî wextê ra çiqas durû bûye.

Wezîrê Derva Ellemann Jensen: Ez wê ifadeya berêz Voigt, ku dibêje em li ber biryar û qerarên dereke stuyê xwe xwar dikin, paşda vedigerinim. Danimarka di vi wari da temamen siyaseteke naskirîne ya durust dajo, ku ev siyaset ya hukumetên kevîn ji bû. Ez tika dikim ku berêz Voigt hûrgûli li ser vê pîrsê bifikire û xeyal bike ka encama qeyitkirina kesana li gor koka wan ya etnik wê çawan be. Belki ji bo xorteki wek Pelle Voigt ne mumkun e ku xwe-diyê zanina diroki be. Tenê çend salên beriya niha bifikire berêz Pelle Voigt? Ev pîrs heta bêji ciddi ye. Li gor Albrechtsen, ez piştgiriye didime wê êrişa ku bûye sedemê kuştina kesên sivil. Ez dixwazim bêjim ku ev iddia han li der-vayî mantiqê ye. Pêşiyê ez gotina xwe ducar bikim: Li wir û li herderê, pêwist e em çarelê-kirinên bî riya aştiyê daxwaz bikin.

Diyar e ku welatê NATO'yê Danimarka û hukumeta Danimarkayê ku piştgiriya cuntayê dike, mafên kurdan nas nake. Di raya giştî da û di parlamentoyê da, li dîji tewrê Danimarkayê protestoyeke berbîçav bilind dibe. Li hember pîrs û gazinên van herdu mebusan, Wezîrê Derva bersivên revoke û sergirtî dide. Wezîr efendi kuştin û qetliamên li ser gelê Kurd ku ji sedsan laran virda domdikin, davêje piştguhê xwe û serda ji derewan dike. Li gor vi hevalbendê cûnta Tirk, gelê Kurd ji qetliam kirine. Wezîrê Dani-

markayê bî derewan û durûtiya xwe ku layiqî paşverû û zordestan e, dixwaze reş û sipî tevlehev bike û piştgiriya ku Danimarka dide cûntayê ji ber çavan veşêre. Ew naxwaze curma li dîji gelê Kurd êşkere be. Çimki di vê curmê da pîr-hûdik para wan ji heye.

Li ser mafê perwerdegariya zimanê dê, Wezîr bersivên dide ku ji rastiyê û durustiyê gelekî dûr in. Ew dibêje ku kê bixwaze dikare bî zimanê xwe ders bigre, lê wek ku mebusên SF û VS ji bî bira wezîr tinin, li Danimarkayê, ji komên herî mezîn yek ji Kurd in, lê hukumet naxwaze mafê xwendina zimanê kurdi di dibistanên gel da bête pejurandin. Wezîr bî "camêriya" xwe rê nişan dide û dibêje: "Eger 12 kes navê xwe bidin nivisandin, dikarin di dibistanên êvarê da kursa ziman bigrin." Bona vê yekê hiç hewce nîne Wezîr rê nişan bide, yên ku bixwazin dikarin zimanê çivikan ji fêr bin. Çima ew amadekirina mamosta û materiyalên xwendinê, wek hemû biyaniyên din, ji kurdan ra ji hewce nabîne?

Nedayina imkaneke wisa ji Kurdan ra û naskirina hebûna wan ya netewî, ma nayê wê manê ku ew (hukumeta Danimarka) û rejîma despot ya Tirkîyê dikevne seviyekê. Bêşik ev tewrê han ji bo rejîma faşîst piştgiri ye. Wezîr dibêje ku ew grûbên etnik nasnakin, ma gelo ew dikare ji bo Filistinayan ji eyîni tiştan bêje? Gelo Wezîr çima eyîni vi tiştî ji Tamillan ra nabêje.


Tewrê hukumeta Danimarkayê û Wezîr li ser vê pîrsê, hin berê ji kifş bûbû, dema ku KOM-KAR-Danimarkayê û redaksiyona du radyoyên Kurdi yê lokal bî hevra ji bo weşana kurdi di radyoya nawendî (merkezî) da muracaat kiribûn. Di bersiva muracaatê da gotibûn ku "ji ber sedemên aborî û siyasi" wê nûkarîbî bî kurdi weşana radyoyê bikin.

Pêwist e ji Wezîr bête pîrsin, gelo ji bo muhacirên din û ji bo gelek zimanên din pere heye, çima ji bo zimanê kurdi ewçend feqîr dibim. Û ew "sedema siyasi" çî ye?

Têgihîştina van gotinên Wezîr ne dijwar (zehmet) e. Çimki ji aliyekî va gerek e ew endamê NATO'yê Tirkîyê bîparêze; lê tiştê herî girîng ku Wezîr dixwaze hertim bî bira mebusan bine, ew e ku, Danimarka ji welateki wek Gronland ji xwe ra kûriye kolonî ku ev welat gelekî fireh, bî heyiyên sererd û bînerd va gelekî dewlemend e.

Lê em bawer dikin ku emê bî xebata xwe û bî alikariya hêzên demokratik yê Danimarkî va, van mafên xwe bigrin û xebata me ji bo vi tiştî wê dom bike.

"PIŞTGI RIYA VAN XULAMÊN DIJMIN MEKIN KU ZÊTIR XWINA WELATPARÊZAN NERIJININ !"



RAMAZAN ADIGÜZEL

1.1.1950 - ...

ELİ XOCE BI DESTÊ APOCIYAN HAT KUŞTIN

Piştî şehidbûna Eli Xoce (Remezan Adigüzel), di mala wi da destnivisek wi hate ditin ku wek name ji heval û hogirên xwe ra hiştî bû. Ew di yê namê da behsa jiyana û tekoşina xwe dike, her usa ji, weki his û texmin dike ku, dijmin û xulamên wi êriş binne ser.

Name dirêj e. Em, çend beşên wê bi kurtî dîweşin:

"Wexta ez li lisê telebe bûm li Iraqê tevgera Barzanî pêşta çû bû. Ez xorteki gelek dindar bûm. Lê agirê welatparêzi kete dilê min û wi agirî heya iro bi xurtî dîweşinim.

Di sala 1971 da, di dema cunta faşî da li Edenê hatim girtin û gelek tede û lêdan dit. Serokê polêz ji min xwest ku di nav xwendekaran da bo wan bixebitim û casûsiya wan bikim. Got, "eger tu vi kari biki emê li karxana Bossayê ji te ra kar bibinin". Wê demê betal bûm. Pîr caran du rojan da carê nan dîxwar. Lê min ev pîsi qebûl nekir. Bona ziktêriyê namûs û şerefa şoreşgeriyê fîda nekir. Û her usa ji, min ev yek xeber da hevalan.

Lî Bingolê di avakirina rêxistina mamosteyan da min ci girt. Bo hişyarkirin û rêzkirina sedan kes xebitim. Bo vê yekê ez ji wezîfê hatim dûrxistin û gelek caran ketim hepsê. Rojeki ez ji hepsê derketî bûm, lê berê çûm komela mamosteyan. Di wê rojê da faşîst û polêzan êriş anîne ser komelê. Me berê wan da û zora wan bir. Bona vê yekê disa hatim girtin û cardin, bêyi ku mala xwe bibinin, dişa çûm hepsê.

Di hepsê da faşîstan dixwest girtiyên din bikin dijminê me. Ji bo me digotin "evana kafîrî, dê û bav nasnakî..." Min quran girt dest xwe û xwend. Û min ji wan ra got ku "dîwê merwên dindar ji welatparêz bin." Êdi bir û bawerîya wan guhari, guh nedan faşîstan û bûn dostê me.

Di sala 1978 da Enstituya mamosteyiyê li Bingolê di dest faşîstan da bû. Me şeş hevalê Rîya Azadî tayîna xwe derxiste wir û di demeki kurt da ew der ji faşîstan paqî kir û kire qeleheke şoreşgeran.

Lî Bingolê faşîstan sê caran ji min ra dafik danin ku min bikujin, min xwe jê xelas kir. Carek ji bombe avêtine malê me.

Dem a eskeriyê, bo hişyarkirina xebatkarên Kurd û Tirk xebitim. Lî leşkeriyê xebat û propağandeya şoreşgerî gelek zor e. Lê me pêk ani. Lî Etimesgutê xortên Kurd û Tirk vê yekê baş dizanin.

Piştî hatîna hukma faşî, sala 1980, li Bingolê tevi hevalan ez ji derketim çiyê. Dî wê demê da gelek caran li min geriyên. Rojeki bo karekî çûm bajêr û hatim girtin. 9 roj eza û tedayek mezin li min kirin. Bî cop û bî feleqê li min xistin. Bî lingên xwasi li ser şûşên şikesti meşandin. Elatrik dane laşê min. Lê min xwe ji mirinê ra hazır kir. Got "sirên xwe ji tevli xwe dibim çêtir e". Min agirê azadiyê, şan û şerefa şoreşgeriyê li erdê nexist. Ewana tu tişt ji devê min negirt. Mecbûr man niwiri ez berdâm.

Piştî berdanê, bî daxwaza Partiyê derbazi Kurdistanê Iranê bûm. Lî wê xebitandina gelek silahan hin bûm. Tevî şerê germ bûm. Tevî pêşmerge bî karên siyasi ji mijûl bûm. Min ji wan

insanan hezkir û wan ji ji min. Lî Soma-Bradost, Enzel, Şino, Negedeh, Mehabat, Piranşar, Serdeşt gelek dost û heval naskir. Gelek nav li min kirin. Dîgotin "Melle Eli", "Eliyê Komunist", "Eliyê Şofor"... Lî Kurdistanê Iran sê salan mam.

Min dî kar da tim barê giran girte piştî xwe. Min xwest tim li pêşiyê biçim. Dî karê şoreşgerî û rêxistinî da tucar dudilî û sistî nişan neda. Bo van tiştan pesna xwe nadim. Lê dîxwazim, piştî mirina min, heval dî vê rê da her bimeşin.

Heya iro destê min neket xwina welatparêzan. Ez diji şer û pevçûnan im dî nav welatparêzan da.

Çî heye ku, dî vê dawiyê da bendê Apociyan ketiyê destê ajan prowakatoran. Sazûmana zordest a Tirkîyê dîxwaze Kurdan berde hevdu û xwin birije. Rojnamên Tirkîyê, ajansên dewletên imperyali, radyoyên wek BBC nav û dengê Apociyan belav dikin, propagandeyeki mezin ji bo wan dikin. Dîxwazim tevgera netewî ya Kurd bikim geliyeki şaş û bixeniqinin.

Şerê Apociyan bo kê ye? Bî vi awayî ji Kurdistanê ra xîzmet nabe. Ew dijminahiya şoreşgerên Kurd û Tirk dikin. Ev karê Ewren û Ozal'e, ya monopolan e. PKK heya kengê xîzmeta wan dike?

Îro Apoci derxistine pêş me. Lê em naxwazim şerê wan bikin. Ev şer bî kêrî dijminên gelê Kurd tê. Ez ne dîxwazim Apociyeki bikujim û ne ji Apociyek min bikuje. Em bo rizgariya Kurdistanê û sosyalîzmê şer dikin.

Lê Apoci bî piranî nezan in, wek miridê şexan in. Şêx çî dibêje bawerîya xwe pê timn. Serokên wan rêxistin û kesên şoreşger û welatparêz wek dijmin nişan didin û ew ji wusa bawer dikin.

Min gelek caran got û cardin dibêjim. Armanca me rizgarkirina welatê me ye. Eger bî destê xulameki dijmin bêm kuştin, yan ji yekî ji wan bikujim, ji gelê Kurd daxwaza min ev e ku, rastiye tim bî camêrî û bê westan eşkere bike.

Piştigriya van xulamên dijmin mekin ku ew zêtr xwina welatparêzan nerujinin!

- Bîmre prowakatori!
- Bîrakuji êdî bes e!
- Kî ku diji vê xwabiyê dernakeve ne welatparêz e!
- Eger xwina me birije, bila dijmin birijine!
- Di ji kolonyali, imperyali û faşiyê yek bin!
- Ne teslimî şaşî û xeletîyan ne ji teslimî dijmin bin!
- Bîji Kurdistanê azad û demokrat!

27'ê Adarê 1987
Remezan Adîgûzel
(Eli Xoce)

Heval û
Dostên
Eli Xoce
Erkên Ser
Milên Xwe
Jî Bo Wî
Bî Camêrî
Anin Cih



CIVÎNA STOKHOLMÊ

Hêzên welatparêz yê Kurd dî navbera ra xwe û çeta prowakatoriyê-Apociyan da divê xetek qalind bikişinin.

Bî cewata êrişên ajan-prowakator Apociyan û şehidkirina welatparêzê hêja Remezan, Partiya Sosyalist a Kurdistanê Tirkîyê dî 23'ê meha Gulanê da li Stokholmê cewinek pêkani. Dî civinê da li gel hevrê û dîlxwazên PSKT ji her çar parçeyên Kurdistanê nûnerên parti û rêxistinên welatparêz, nûnerên hêzên pêşverû yê Tirkîyê û gelek kesên welatparêz beşdar bûn.

Dî civinê da Sekreterê Gîştî yê PSKT Kemal Burkay bî kurdi axaftnek kir. K.Burkay dî axaftina xwe da got ku: "Ew êrişên ku bî destê maşikên Apociyan li dervayî welat têne kîrîn bî taybetî li dîji tevgera Kurd ya netewî û bî tevayî li phember pêşverû û demokratên Tirkî û

Kurd prowakasyonêk e.

Van bûyerana bî kêri rejima faşî û kolonyalist a Tirkî û hêzên kevneperest yê Rojava ku piştgiriya rejima faşî dikin tê.

Vana dîxwazîn bûyerê bî vi rengî zêde bibin û ji xwe ra bîkî sedemên tade û zordariyê li ser hêzên pêşverû yê Kurd û Tirkî. Ji nîha va hazîriya tedbirên weha dikin.

Bî van kîrînên Apociyan tevgera Kurd dî platformên navnetewî da bê rûmet dibe...

Ew hezkîrîn û sempatiya ku ji gelê Kurd ra çê bûbû li dervayî welat, bî van kîrînên Apociyan qels dibe "got.

Her weha bangê hêzên welatparêz, pêşverû kir ku xeteki qalind dî navbera xwe û çeta Apociyan ya prowakator da bikişinin.

Dî civinê da axaftnek bî tirkî hate kîrîn û nama Remezan ku beri mîrîna xwe nûvisibû hate pêşkêşkirin.

HÜSEYİN ALİ AKAGÜNDÜZ

BI DESTÊ APOCIYAN HAT KUŞTIN

DI VÎ ŞERÎ DA HER KÊSÊN KU DIKEVIN WÊ BIBIN SANCAX

Jî karkerên Kurdistanê û Tirkîyê ra,
Jî mirovên welatparêz û demokrat ra!

Dijmînen gelê Kurd disan xwin rêtin canekî dî ji standin. Serokê komela me, şoreşgerêkî mîrxas fedakar û zana Hüseyin ALİ AKAGÜNDÜZ, li Parisê bî destê ajan-prowakatorêkî rejîma kolonyalist-faşîst, li orta rê, bî şaşegrê, ku piştra berdanê, hate şehidkirin.

Hevrê Hüseyin dî sala 1960'î da li gundê Lodek, qeza Mazgirtê ya Dersimê hate dinê. Ji malbateke xebatkar û ji 9 zarokên malê yê duwemin (2.) bû. Li Elezîzê û Bingolê lise xwend. Piştra dî sala 1973'an da hate Fransayê cem bavê xwe ku li wir karker bû. Li Parisê, dî Unîversîtê da dest bî xwendina ilmê ekonomiyê kir. Ji alîki va, wek xortekî çav-vekirî kete nav tekoşî-



na siyasî û li dervayî welat piştgiriya têkoşîna rîzgariya gelê xwe kir.

Li Fransayê, ji bo rêzkîrîna karkerên me bî fedakari xebatî. Ji ber pîrbûna van kar û xebata, ku pir wextê wi digirt, xwendina wi ya Unîversîtê zehmet bû; wi ji terciha xwe kir, xwendin berda û xwe temamen da xebata şoreşger.

Hüseyin Ali, ji sala 1983'an şunda serokatiya Komela Karkerên Kurdistan li Parisê (KOM-KAR-Fransa) dikir. Bî zaneyiya xwe ya bilind, bî baweriya şoreşgerî ya xurt, bî fedakari û jêhatbûna xwe, dî tevgera rîzgariya gelê Kurd da roleke giran da ser milê xwe. Li Fransayê, ji bo ku doza kurdi bî dorhêlên pêşverû bide naskîrîn û li wi welatî piştgiri û alîkariyê ji gelê me ra bide bilindkirin, wi xebatekî jêhatî kir.

Dî sala 1985 meha Gulanê da li Pragê, wek

nûnereki DHKD beşdari civina rêxistinên ciwanan ya navnetewî bû, û disan wê salê di meha Tebaxê da tevî festivala 12. ya Civan û Xwendekarên Cihanê bû. Di herdu ciwanan da bi navê DHKD qise kir. Derd û pirsên ciwanên Kurd û gelê Kurd ani ziman.

Ev xebata wi ya girîng û serfiraz, ne tenê di çavê rejîma kolonyalist-faşîst da lê herweha di çavê maşeyên wan, di çavê ajan-prowakatorên Apoci da ji bû kelem. Ew yek ji wan şoreşgeran bû di serî da wan ji qetilkariya xwe ra kirin hedef.

Çeta qetil-xûn, apociyên ku hevsarê wan di destê dijminên gelê Kurd da ye, gelek caran bi telefon yan bi awayên din, Huseyin û malbata wi tehdîd kirin.

Ev şoreşgerê xort, hê ku dîkaribû gelek salan keda xwe têke nav xebata rîzgariya gelê me, roja 16'ê Heziranê saet 14,30'an da, piştî ku bi tenê ji komelê derket, qasî 500 metre ji wir dûr, li Bulvara Şato bi destê ajan-prowakatoreki ji piştva bi xayîni hat gullekirin û şehîd ket. Bi gulleyan qetilkar du jinên Fransîz ji hatin birindarkirin.

Li naverojê, li Parisê li orta suka qelebalix ev cinayeta qewmî, lê, qetilkar hin ji nehatiye girtin. Lê berpirsiyar ji aliyê me û aliyê raya giştî va tê zanin. Berpirsiyarê vê êrişê bêşeref dişa çeta Apociyan e ku ev çend salin li welatên Ewropayê êrişê dibine ser komelan, agirdadaya dîkin, êrişî kesên şoreşger û welatparêz dîkin û wan dîkujin, birindar dîkin û vê xirabiyê ji xwe ra dîkin siyaseta bîngehî. Yê ku do E. Ata, Zulfü Gök, Çetin Güngör, Kürşat Timuroxlu, Bülent Yaman, Mustafa Tangüner, Resul, Mahmut Bilgili û gelekên mayin, û vê dema dawiyê ji şoreşgerê mîrxas Ramazan Adigüzel kuştin, disan ev çete ye.

Lê helbet berpirsiyar ne tenê ew e. Berpirsiyarê eslî yê vê pêla teror û cinayetê dewleta Tirk ya kolonyalist û faşîst e. Çeta Apociyan mehsûlê wan e. Li piştî perde MIT heye, rêxistina bi navê "Daira Şerê Dîji Terorê" heye.

Ajanên Diktatoriya Faşîst, di tevgera Apociyan da serê avê girtine û ketine nuqteyên kilit. Van du - sê salên dawiyê, "Timên dîji Terorê" ku ji aliyê polêsên Elman va hatine terbiyekirin, bi dehan kes ji wan derbasî nav Apociyan bûne. Niha ew wek endamên "PKK" û "ERNK" dixebitin û karên xwe dîkin...

Geli welatparêzan,
Kesên demokrat,
Zehmetkêşên Kurd û Tirk!

Ne tenê rêxistina me KOMKAR, ne tenê ev yan ji ew şoreşger, rêxistin yan ji komeleyên

welatparêz û demokratîk li dervayî welat hemû rêxistinên demokratîk û multeciyan siyasi, di bin tehdîteke eşkere û di bin êriş û prowakasyonê da ne.

Êdi wextê ditîna mezinbûn û ciddiyeta talûkê û li dîji wê, li gor wê tewr girtin hat û derbas ji dibe. Rejîma kolonyalist-faşîst, dixwaze muxalefeta demokratîk bipelêxe û belavke. Armanç ew e. Ew, di vi işî da bi hukûmet û hêzên paşverû yê welatên Rojavayê va hevkarîyê dike. Ev êriş ji gelek aliyên va hatiye plankirin.

Ji ber vê yekê êriş û bûyer wê dom bikin. Eger pêşî lê neyê girtin, eger di vi warî da, di nabeşîna hêzên şoreşger, demokratîk yê Kurdistanê û Turkiyê da hevkarî û xebateke muştêrek pêk neyê, ev plana prowakasyonê nayê pûçkirin. Eger pêşî lê neyê girtin tu kes nikare xwe ji hedefa wê dûr bixe.

Em, bang li hemû rêxistin û kesên welatparêz û demokratîk dîkin ku li dîji vê prowakasyonê berpirsiyarîyê bigirin û li dîji êrişên dijmin û maşîkên wan bi awayekî aktif tewrê xwe kifş bikin.

Tevgera Apoci ku ji roja derketina xwe heta niha, hemû rêxistinên şoreşger û welatparêz ji xwe ra dijmin nişan daye û êrişkirina ser wan kûriye siyaseta esasi û dixwaze wan belav bike û ji ortê rake, eşkereye ku ew rêxistîneke paravan e di destê dijmin da. Ew çeteke qetil-xûn e ku bi navê welatparêzî vi işî dike... Li welat û li dervayî welat, ji destpêkê heta niha ew di vi işê qilêr da tê xebitandin û ew bû haletek ji bo prowakasyonê li dîji gelê me û hêzên wi yê welatparêz.

Mirovên welatparêz û demokrat, PKK'ê baş nas bikin. Ew, milê dijmin yê pênca ye. Ajan û prowakator wê idare dîkin.

Dijmin bi vê terorê, bi van êriş û cinayetan, dixwaze pêşî li xebata me bigre. Ew, çend sal in ku ji xebatên KOMKAR'ê û hêzên din yê demokratîk, gelekî acîz dibe û diqehire. Ew, dixwaze Newroz, xebatên me yê kulturî yê din û bi gelê me ra piştgrîyê bide sekinandin.

Lê bila dijmin û maşeyên wan zêde şa nebin. Ciyê Huseyin Ali wê vala nemine. Şerê ji bo armanca ku wi di oxirê da serê xwe dani, wê nesekine.

Em yek dîjin hezar tî!

Yên ku di rîya azadiyê da dikevin, ew nemirin; di vi şerî da ki bikeve wê bibe sancaqekî!

Bimre cunta faşîst û maşîkên wi!

Şerê rîzgariya gelê Kurd, wê heta serkevtinê here!

21.6.1987

KOMELA KARKERÊN KURDISTAN
LI FRANSA

ŞA'IR Û NÛSIRÎ KURD

SUWARE

Şa'ir, edib û nûsiri cuwane-mergi Kurd kak SUWARE le sali 1952 (1940 mldi.) le şari Seqız le Kurdistanî İnan hate Dunya. Bawki Suware nawi Ehmed Axayi Elxani ye û le gundi Hema-miyan deji.

Suware le sebk û rêbazi şî'r xoyi le ser şewey GORAN (Ebdulla Goran) roli zor wane rêga-êkida qedemi helgirt û renge tenya kesêk bê ke le Kurdistanî İranda tuwani rêbazi şî'ri Goran be başi bepêwe.

Suware her ne tenya şa'ir bû belkû nûsir û romannîwis û num-belkû nûsir û romannîwis û nima-işnamenûsêki gewreyi Kurd bû.

Çendin nimaîşnamey wek:

- 1) KAWÊYÎ ÇEKÛŞ WEŞÊN
- 2) LAS Û XEZAL
- 3) XALEÎ RÊBWAR

Û her weha katê ke le beşi Kurdi Radyoyi İranda kari de-kird bernamêki edebi be nawi "Tapo û Bûmelel".

Berhem û şewenewar Suwarey be kurdi û farisi nêzikey 1500 laperey le lay min heye.

Suware le temeni 34-35 salida le şari Tahran le 24.10.1354 (1976 mldi.) da mird.

Suware her tenya kurêki heye be nawi Babek.

Suware le dewrani Şayida nêziki 5 salan le ser kurdayetî zindani bû.

Ehmed ŞERÎFÎ

XÊLÎ DIRO

Ê we kê n....? xêlî dîro

Gelê dem pîr le hera

Nişte gêy şari be germe û dûkel

Pêm bilên ewê çikaren? çi kesin?

Ê we ey kîrmi kîtêb, yari xari hoda

Be geroyi kaspekere ke tarin

Cari kam gum bû eden wa be helpe û be deho...?

Ê we miratgiri kam cê lewrîn...?

Ê we haşargiri rû bendi ûşe

Bûki bîm taray sor

Xuwa neke bay bête wejmi Kuwistan

Laberê perde le ser balatan!

Derkewê her wekû jîn dûre-dûr

Ê we key şêri çiyân?

Ber demaw xori tuî ûgurgi gerin

Qaqire giyan heway ber piştên

Şore katê ke kujey xelfi dest

Zelkeiye korekatan, ewe zelîn

Her be bayek degerên bê derbest

Kam be yan ber bû le bendi şewezeng?

Kame pêşkete pisi retan?

Êste wa girmey le kêwan berze

Miş exate leşi bûme lerze

Êwen û êwen û lokey guwêtan

Besiyeti, besiyeti wa hat û wa çû



TO DÊRIYAMI

To dêriyami
Be rowanini dû çawi şini bêbint
Be xawênit be aramit
To dêriyami
Be şepoli lence û larit
Be tureiy carcart
Be şenge jini, be samit.
To deşti ewper ne diyari
Bo çul biri le pê kewt û
Tapoi şari.
To şorebi naw şorekatêki germi
Trawilkei tinwi diyar û ne diyari
Hiwai tinwi rêbuwari
To şorebi naw şorekatêki germi
Le ber nigai tasebari ewindara
Xo dapoşiw be lik û poi keziyei nermi.
Belam ey kij!
Ey çaw nerm
Ey xenceri o tolei tij
Emro min le xestexanem
Ne huşiyarim, ne le ser xo
Layeki birim lai genci
Be demi bîrin pêkeni
Be şorei wek polai leşi
Rêgai çekmei suri xowên û
Desti reşi basi teni
Layeki birîşm lai to.
Na... ey henet wek mangaşew
Na... ey deriyai mendi çaw be xew

Giri ax bermede giyanim
Be nigai aşnai lê kujrawan memtasêne
Xom zamarim be xowêiy towanc
Mem kulêne û memtasêne
Melê xozya dezgiranim
Pale û pişti jiyanim
Bîmerdaiye...
Belam emro
Ke her satê dîli daiyê le Kurdîstana heleqirçê
Be her bombai sûtênerêk
Pêşmergeyek
Dari çakêk da eqirçê
Nem kutbaiye niwei bîrm lai toiye
Megiyi û melê dezgiranî renceroiye
Be zareyi le zerde zize
Be arami ke şiweyi dilmendi to ye
Melê bes em govtugoye.
To lat waiye mîn nazanîm.
Sîkalayi deldayi xoşe!?
Belam emro mîn beşêki Kurdistanîm
Kiji sed bîra kujrawî niştîmanîm
Taze masî tasebarî destî tinuwt
Rêy niye bo deriyayi sinem
Hêndeyî xowa xoşewîstî
Belam!
Mîn kijêki Kurdîm
Ceheneme giri kinêm.

Payizi 1974



Ji Nav Edebiyata Kurdî ya Klasîkî

ELÎ HERÎRÎ

(1009 - 1010 – 1080)

Ji aliye hm edebiyatnanan va te gotin weki helbestvanê kurdi ye heri pêşin Baba Tahir Hemedani ye. Hemedani bi zaravê hewremani helbest nivisîne. Lê li gor hm edebiyatnanan ji ew wek şaireki farsî te jimartin. Piştî Baba Tahir Hemedani, Eli Heriri te ku Kurdnasê rûsî Aleksander Jaba wi wek şairê kurdi heri pêşin dide zanin.

Eli Heriri di sala 400'ê hicrî (1009-1010) da li gundê Herirê hatiye dinê. Ev gund li hêla Hekariya (Colemerg) girêdayî Şemdinan e. Eli Heriri di sala 470'ê hicrî da li gundê xwe mîriye û li wir hatiye binaxkirin.

Li gor agahdariya kurdnasê Rûsî A. Jaba, bi navê "Şîr û Qesideyên Heriri" diwaneke wi heye. Lê ev diwan heta niha derneketiye meydane.

Şîrên Eli Heriri heta niha di hun pirtûk, rojname û kovaran da parekêda hatine weşandin.

Prof. Qanatê Kurdo di "Tarixê Edebiyata Kurdî" da, agahdariyên li ser jiyana Eli Heriri û hm numûneyên helbestên wi pêşkêşî xwendevanan kiriye. Lê çawan ku mamosta Qanatê Kurdo ji dîde xwiyakirin, diroka edebiyata kurdi ya kevn hela hin baş zelal nebûye, hewceyî lêgerin û lêkolînê ye.

Mamosta Qanatê Kurdo, di pirtûka xwe da navê kovar, pirtûk û kesên ki li ser Eli Heriri nivisîne diyar kiriye. Em bawer dikin ku di paşerojê da edebiyatnanên kurdi wê bêtr bala xwe bidin ser edebiyata me ya kevn, lêkolinan çê bikin û wê baş derxin nav ronahiyê.

ÇEND HELBESTÊN ELÎ HERÎRÎ

Bi halê eşq bexil bûbûm
Her dem di dem zelil dibûm,
Bê rêh û bê delîl dibûm
Her kes bi xemxwarî dikin.

Hûn bar mekin xemên di zor,
Le hesreta vardên di sor
Çavê di rêş bisk tene dor,
E'niya bi nûr tarî dikin.

E'niya bi nûr zilf tene ser,
Rengîn dibin şems û qemer,
Reşmar ji perdanê neder,
Li e're'ra yarî dikin.

Hoş û e're'ra şimşa diket,
Teşmîn reva sebir û xîret,
Qahu medet, ahu medet
Çeşman çî xubarî dikin.

Çavê li rojê bine kom,
Came mey anî ji bom
E'mir kir lazim vexom,
Mestî ji min jarî dikin.

Mest û şerab qendavê,
Êsîr û bendêrê vê şevê
Ger vesfê yarê ez bibêr
Hûn terkî huşyarî dikin.

(A.Sosin, Kurdische Samlingen 278-279).

*

- Xelqno, werin bibînin,
Çi husneke bi kemale,
Heyran ji dil bibînin,
Ji sene' zewal celale.

Sene' xwedê ku danî,
Sifhe ji nûrê danaye,
Enber li ser kêşaye,
Enber xet di xale.

Xalên di şibê enberî,
Dêm her wek qemerî,
Ez t'êr nabim ji munzerê,
Min naçit ji xeyalê.

Min qet naçî ji birê
Zilfêr şibê herîrê,
Wê li ser be di mûnîrê,
Dagirt bûn helale.

Ebrû helala eyde,
Dêm her wek xurşide,
Eblek şibê Nahîde,
Cibhet meha bi kemale.

Cibhet meha tevave,
Rû sor gula bi xunave,
Reyan hatne hindave,
Nesrînyan da û pale.

Nesrînyan çû wext beste,
Min nêrî pê hoste,
Eqlê min çû ji deste,
Heyran kirim der hale.

Heyran bûm ez ji dinê,
Sohtim ji dest evinê,
Ji xwe nakim hîvya jînê,
Li-m kêr bûn mah û sale.

Li-m kêr bûn mah û salan,
Metne ji lam û dalan,
Ji ber zehmet û eşkelan,
Ez t'êr dikim miqale.

*

Çavê min xûn jê dibarî,
Ji ber eblqêt xumarî,
Wekî ava di carî,
Bê wext û bê macale.

Gerden şûşa nebatê,
Lêvê şerbeta heyatê,
Ji hisna bit welatî,
Bi min cahî helale.

Methê di nazeninan
Û serê di xûn şîrinan,
Wekî dûr û yasînan
Ez her dikim emale.

Baxê ku sed bihar lê,
Bilbilê lalezar lê,
Ku sed gulê bi xar lê,
Bilbilî nala-nale.

Ji Hindê bînin taracî,
Ji Mermerî bînin xeracî,
Ji Romê bistînin bace,
Ji bo xemla şepale.

Dêma xalê di hûr lê,
Eyna zilfêr stûr lê,
Rû nîva guhê tûr lê,
Mehbûbe bê misale.

Hisna te ya hebîbe,
Dilekî min jê xerabe,
E'îf tu bikî nesîbe,
Dest bidît wesa'le.

Hisna te ya dilxahe,
Dilber lebsî sîyahe,
Bi min kaa'be Ella,
Tewaf dikim her sale.

Ji Hind bînin talanî,
Bikin gilî sibhanî,
Ji bo çavê şa - siltanî,
Dema bêtin ser sale.

PIRSGIRÊKA KURDISTAN Û PÛÇBÛNA SIYASETA 60 SALÎ

"Bî navê Kurd milletek tune", "yên ku ji xwe ra dibên Kurd Tirkên çiyayî ne", "Kurdi ne zimanek e. Ew zaravayek e ku ji Erebi, Farisî û Tirkî pêkhatîye", gotinên weha piştî êlankirina Komarê (cumhuriyetê) siyaseta burjuvaziya Tirk ya kolonyali ya li dij gelê Kurd bî kurtî dîde xuyakirin. Tabîi ye ku siyasetek weha bê tede û teror nîkarîbû bîhata meşandin. Jixwe wisa ji bû. Îqtidara kolonyali ya burjuvayê, ji roja ku hukim kûriye destê xwe virda di Kurdistanê da çerxek zulmê, ku hemû cûreyên insani û exlaqî ji çavan dûr dîxine, dîde xebitandin. Rejîma nijadperest li hember gelê me qirkirinan, nefîkirinan, êşkence, kûrkirina berhevdanên eşiri û mesebî, asimilasyon û paşî zêdekirina belengaziye bî kar anîne û vana şanoyên helandinê yê n sereke ne.

Êşkere ye ku sazûmana Kemalist, bî vê siyaseta xwe ji sazûmana Osmanî ji paşdatir dûma. Dî dema padişahiye da ji qirkirin, nefî û cûre-cûre texlîdên zulmê hebû, lê xebitandina gotinên Kurd û Kurdistan ne qedexê bû. Kes ne digot ku "Kurd tune." Armanca ku di hate ajotin çî dibe bîla bibe, bî hejmareke hundik be ji, dîbistanên ku perwerdegariya kurdi dûmeşandin hebûn. Cîwanên Kurd dikarîbûn xebata pêşdabirina zîman û çanda xwe bîkî û li gor vê xebatê dikarîbûn xebata rêxistinî pêk binin. Mesela, di sala 1910'an da li Stenbolê bî navê "Kürt Neşr-i Maarif Cemiyeti" komelek hebû.

"Kesên ku meclisa me ji wan pêk tê ne tenê Tirk in, ne tenê Kurd, ne tenê Laz, ne tenê Çerkez in; lê bî mewcûdiyeta xwe beşeki (anasîrî) islam in."

Li aliyê dîm rêvebirên komarê, bî vê siyaseta ku dajotin di eyîni wextê da bî kiryarên xwe yê n kevî n ra ji diketin nakokiyê. Mîstefa Kemal, di sala 1920'î da di axaftîna xwe ya vekirina Meclîsê da "Kesên ku meclisa me ji wan pêk tê ne tenê Tirk in, ne tenê Kurd, ne tenê Laz, ne tenê Çerkez in; lê bî tevayîya xwe beşeki islam in.." dîgot. Di sa salek berya vê bûyerê 20'ê Çîriya Pêşî n 1919'an da di navbera M.Kemal, hevalên wî û berpirsiyarê hukumeta Stenbolê Salîh Paşa da Protokola Amasyayê hate imzekirin, Protokol ci dîda vi danêri "ji bo ku pêşkêrîna Kurdan bî serbestî pêk bê mafên wan yê n nîjadi û sosyal wek xwe hate qebûlkirin.."

Lê piştî ku şer kuta bû û dewleta Tirk ya nû xwe li ser piyên xwe ragirt, hemû van soz û bextan ji alî kolonyalîstan va hate ji bîrkirin. Êdî dor hatîbû ser înkarkirina Kurdan û bî qirkirinê, nefiyê fetîsandîna daxwazên wan. Rêvebirên Tirk ji bo serfiraziya siyaseta xwe ya domkîrî rastiyên dirokê avêtî n qerexekî û dest bî çêkirina dîtinên dirokê yê n derewî n kîrî n. Di bî n navê xebatên îlmi da ji bo îlm gelek rûreşî û dek-



ZORDESTİ

Dı nav 60 salan da siyaseta hukumetên Komara Tırkiye lı dji gelê Kurd: Zulma cendirme û komando, paşdahiştin û talan bû. İro ji zulma wan ra sinor tune.



SERHILDAN

Gelê Kurd gelek caran lı ber zulmê rabû ji bo azadiyê şer kır. Lı jor dîtemek ji şerê Şêx Seid.

dolav hatin raxistin. Dî dema hevpeyvîna Lozanê da serokê nûnerên Tirkan İsmet İnönü, veşartina netewebûna Kurdan bila li wir bîmine, paşpêki, bal dikşîne ser netewa Kurd; "Hukûmeta MMT bî qasî ya Tirkan e ewqas jî hukûmeta Kurdan e.." û pêwîstiya vê gotinê dibîne. İnönü hûnek dî jî pêşda diçe "Wek nijada Kurd nijadeki bîlîndin.." jî xebitandina vê peyvê jî paş namîne. Dî wê demê da dî MMT da bî qasî 73 mebûsên Kurd hebûn û wana bî navê "Koma Kurdistan" grûbek pêkanibûn.

"Em li welatê herî azad ku navê wî Tirkîye ye dijîn, mebûsê we jî dilê safî jî bo pêşkêşkirina baweriyên xwe şert û zurûfek jî viya çêtir nikaribûn bîdita. Ji ber vê yekê ez ê yên dilê xwe veneşêrim. Tirk, yekane efendiyê vi welatî, yekane xwediyê wî ne. Yên ku ne jî nijada saf Tirk bin dî vi welatî da tenê mafekî wan heye: Mafê xulamtiyê, mafê kolebûnê. Bila dost û dijmin û hetta çiya vê rastiye weha zanibin."

Ew İsmet Paşayê ku dî Lozanê da behsa biratiya Kurd û Tirkan dikir û digot "wek nijada Kurd nijadeki bîlîndin", dî sala 1930 da dî vekirina riya hesin ya Siwasê da di xeberdana xwe da "dî vi welatî da tenê netewa Tirk xwedî mafê daxwazên etnik û nijadî ye. Weki dî mafê tu kesî tune.." digot ev neqlî. Dî eynî salê da Wezirê Dadi Mahmut Esad Bozkurt jî vi siyaseta ku Nazîzm jî pê heyrîmayî dîma weha dîani ser zîman: "Em li welatê herî azad ku navê wî Tirkîye ye dijîn, mebûsê we jî dilê safî jî bo pêşkêşkirina baweriyên xwe şert û zurûfek jî viya çêtir nikaribûn bîdita. Ji ber vê yekê ez ê yên dilê xwe veneşêrim. Tirk, yekane efendiyê vi welatî, yekane xwediyê wî ne. Yên ku ne jî nijada saf Tirk bin dî vi welatî da tenê mafekî wan heye: Mafê xulamtiyê, mafê kolebûnê. Bila dost û dijmin û hetta çiya vê rastiye weha zanibin."

Bê şik têgihîştina vê siyaseta kolonyalîstî mumkun e. Çînen serdest, jî bo domandina sazûmanên xwe gava hewce be tum dest davêjin vê rêyê. Lê li Tirkîyê wîsa propagandayek şovenî û nijadperestî hate bakirin ku derdorên pêşverû, demoqrata xwe jî tesîra viya, jî beşdarbûna koroya bûrjûvaziyê xilas nekirin. Ango dî derheqa pîrsgrêka netewa Kurd da ne tenê rê-

vebîrên Komarê, ronakbîrên Tirk jî, jî Osmanîyan û Ewliyî Çelebî jî ku berya çend sedsal berê jiyaye, paşdatir man. Vana (ronakbîrên Tirk) bêyî ku li sedeman mêzêkî, hemû berxwedanên Kurd "entrikayên ku jî derva dîzên", "serhildanên kevneperest" diditin û dî sefê kesên ku weha digotin da ci girtin. Wana ne guh dan kiryarên windakirina dirok û çandekî ne jî qirkirina sedhezaran mirov û nefikîrîne..

Perde Vedibe

Dî van rojên dawî da, tevî ku zulm û tedaya piştî 12 İlonê dom dîke em dibînin ku derheqa pîrsa Kurdan da munaqeseyek gur dibe. Ew kesên ku heta do jî tîrsa, peyva Kurd nedidan ser zarê xwe jî bo inkarkirina Kurdan dipirpîtin, iro jî em dibînin ku dest bî guhartina zarê xwe kirîne. Demîrel, "Dî vê navberê da bêjim: Tabîî ye ku li wî alî sinorê Tirkîya me mirovên ku Kurdî dixafîm, dijîn hene.." dibêje. Ecevitê ku berya herkesî bazirganiya demoqrasiyê dîke li Norveçê bersiva pîrsek karkeran weha dîde: "Ez jî dî wê ditîne da me û li dijî im ku li gor hûnêkan li Tirkîyê Kurd, Erebb tune, tenê Tirk heye.." Serokê Qurmaya Gîştî Necdet Urag jî Ecevit jî bêtir "mêrxasî" nişan dîde û aliyê "Büyürên Güneydoxû (Kurdistan N.W) yê etnik" qebûl dîke.

".....Tirkîye, İnan û İraq jixwe jî ber peymanî CENTO'yê dostê hev bûn, planên şirik çêkiribûn ku dî destpêka damezrandina dewleteke Kurd da wê dewletê bî tevgerek karbidestî jî oholê hîlînin.."

Qumandarê kevîn yê Edenê yê İdara Urîfî Korgeneral Bölügiray: "Babeta ku esil dixwazim li serê bîaxîfîm ew e, ku pêşdabîrîna mecala ku mirov jirtir û zanatir nêzkayî bî vê pîrsgrêkê xe, bî zanebûn û munaqeseya bandorên ku pîrsgrêka peyda dikin, dibe. Bê şik bî şertê ku parastina dewletê nekeve xeterê. Dî eslê xwe da van tîştan, bî salan bî awakî fireh dî mercên eskerî û sîvil da hatîne xebirdan û munaqesekirin, lê ew li pişt deriyên girtî û ewraqên arşîvan da mane. Lê ev pîrsgrêk bî nedîtîne û veşartîne nayên windakirin" dibêje. Disa waliyê kevîn yê Mêrdînê û zîlamê MÎT'ê Ergun Gökdeniz derheqa pîrsgrêka Kurd da li gor xwe şîrovekirîne û tehlîlan dîke. Albayek teqawutbûyî, rastiye ku bî salan jî alî rêxistinên Kurd va tê gotin îti-

raf dîke û van tîştan dibêje: ".Ji ber vê yekê Tîrkiye, Îran û Iraq jixwe ji ber peymanê CENTO'yê dostê hev bûn, planên şirik çêkirin bûn ku di destpêka damezrandina dewletê Kurd da wê dewletê bi tevgerê karbidestî jî holê hilînin. Ji ber vê yekê bi van rêxistinên ra pêwendî danin bi heysiyeta dewleta Tîrk nakeve." Rojnamevanê Tîrk M. Ali Birand bi awakî eşkere "îro li hember me 'pîrseke Kurd' heye" dibêje û dîwîsîne. Di weşanên bûrjûvaziyê da hinek nîvîskarên din jî di vê hundavê da ditînen xwe didin xuyakirin. Niha hinek kovarên pêşverû jî ku hêj jiyana xwe didominan jî bo pêşandina êşkence û tedayên Kurdistanê, jî alîkî din va nêzkayî bî vê pîrsê dixin û bî vê hawê kar û xebateke hêja dikin.

Baş e vana hemû çî ne? Munaqêşeyên han xwe dispêre kijan sedeman? Bandora ku li siyasethanên bûrjûva yê nêşmer, serda jî li generalên nijadperest, li zîlamên MÎT'ê dîke çî ne û derheqa hebûna Kurdan da jî qerex va yan jî rast-rast çîma zor digihîje wan? Li kijan çiyayî gur mîr ku li dorhêla bûrjûvaziyê gotînen "qebûlkirina rastîyan", "meyîlkirina çarelêkirînen aqlmendî" tene kîrî.

Eşkere ye ku ev yek, berya her tîştî bî qonaxa ku tekoşîna gelê me ya rîzgariya netewî gihayê girêdayî ye. Wek tî zanî bî taybetî piştî sala 1970 tevgera welatparêz ya Kurd hewl da û bî awakî gurr kete nav kar û barê rêxistinî û propagandayê. Ji ber vê yekê piştî êlankirina Komara Tîrkiyê diwarê derewan yê ku jî alî bûrjûvaziyê va hatîbû lêkirin hejîya, terkên ku nayên pinekîrî tîda vebûn. Riya zanîstiyê û bir û baweriyên welatperwerî ne tenê di nav gelê Kurd da, her wîsa di nav gelê Tîrk da jî bî fîrêhî belav bû û hate munaqêşekîrî. Heta wê rojê bî tesîra propagandeya nijadperest-şoven gelek kesên ku vê babetê wek tabû qebûl dikîrî dest bî ditîna rastîyan û fikîrandina wan kîrî.

Ji ber vê yekê ye ku cuntaya faşî di 12'ê Îlonê da iqtîdar gurt destê xwe, berê tirê tûj rûbarî gelê Kurd û rêxistinên wî yê welatparêz kîr. Cunta, hesabîna dikîrî ku goya bî xwinê û terorê gelê Kurd bitewîzînda, daxwaziyên wan yê rîzgariyê pûç bîkîra. Lê pêşketî qet jî wek ku wan dîxwest ne bû. Gerçî di vê demê da gelê Kurd janên mezî hemêz kîr, hêj jî hemêz dîke. Rêxistinên welatparêz yê Kurdîstanî tîkçûnên grînan ditî. Lê tekoşîna nesekîna, tevgera netewîzî. Lewra hêzên welatparêz di nav tekoşîna gelê me da reh berdabûn û jî wê derê hilqetanî û avêtîna wan ne mumkun bû. Di plana nav-

netewî da jî tevgera Kurd disa di vê demê da xwe gîhand qonaxên wîsa ku xewa kolonyalîstan dîrevandî. Îro êdî kolonyalîst herî kê derê bîla herî, li hember wan pîrsgîrêke Kurd heye. Ew fikîrên pûç ku xwe dispêrîn inkariya gelê Kurd jî xwediyê xwe hinek din jî sosret dikin û bî kêrî tîştêkî nayên. Bî pîrsgîrêka Kurd mijûliya wan eşkere neyê ditî jî, dostên bûrjûvaziyê yê herî nêz jî pişt deriyên gîrtî da dîkevîna tewreki cûda, li dijî siyaseta fermî ya ku tî ajotîna pîr yan jî hundîk dertên.

Herweha di demên dawî da, sedema munaqêşeyên ku di nava gel da geş bûne û zor dîde dorhêlên cûda yê bûrjûvaziyê, ku ditînen xwe beyan dikîna, ev e.

Armanca ku di munaqêşeyan da tî ajotîna çî ye?

Bê şîk di plana legalîtê da derheqa pîrsgîrêka Kurdan da munaqêşeya ku tî ajotîna mirov nîkare bîspêre sedemek tenê. Li gor ku li Tîrkiyê bîngehek cîvaki ya çîneyetî heye û van çî û tebeqeyên çîhê bî ditî û fikîrên cûda li pîrsan mîze dikîna, dîvê mirov vê yekê tabî bîbine. Gava bî vê hawê lê bê mîzekîrîna eşkere ye ku hinek jî li tîda û terora ku li Kurdistanê tî domkîrîna tewreki rexnegîrî nişan didîna û bî rengîkî demokrasî û heqên mirovî da nêzikayî bî pîrsê dîxîna. Disa hinek jî wana hebûna gelê Kurd jî wek rastîyek qebûl dikîna, pîr yan hundîk wî tînin ser zuman. Lê jî bo qîsmek din, bî taybetî di dorhêlên bûrjûva da armanca pişt, "dengên ku bîlînd dîbin" cûda ye.

Wek li jor hate xuyakîrîna, bûrjûvazîya kolonyalîst, berya her tîştî rezîliya domkîrîna siyaseta inkarî li hember gelê me, dibîne ku çawa wî li hundîr û der dîke rewşek sosret. Yê grîngîr jî di refên wî da, hejmarî kesên ku li dijî siyaseta çûkdeve dertên û dibînin ku mirov bî vê hawê nagîhê çîkî, roj bî roj zêde dîbe. Û ev rewş siyaseta fermî ya ku heta îro hatiye domandîna pûç dîke û wan mecbûrê şîrovekirînen çîhê dîke, rastîyên ku bî salan nedane ser zarê xwe dîde îtiraf kîrî.

Bê guman qebûlkirina hebûna gelê Kurd jî bo bûrjûvazîya kolonyalîst gaveke paş e. Ev, di serî da bî cehd û rîka hêzên gelê me yê welatparêz e ku îdeolojîya Kemalîst pûç kîrîye û jî alî bûrjûvaziyê bî xwe êlankirina rîzîna vê îdeolojîyê ye. Evya bûyera tîkçûnek eşkere ye.

Li alî din ev gavê paş ku jî alî dorhêlên bûrjûva va tî avêtîna qey wê di siyaseta jî holêrakî-

rına gelê Kurd da bibe sedemê guhartnek bin-gehî? Helbet nabe. Zîddê wi, wê planên nûtr û xayintir saz bikin û heta ji destê wan bê ji wê berê gel ji pîrsgrêkan biguhêzin û bi vi awayî armancên xwe bajon. Tîştên ku pêkanîna wi tê xwestin, eger bibe belki hinek gotmên kevîn bê terkandî.

Ji ber vê yekê divê mirov li hember manevrayên dijmin şiyar be û vatîniya nişandana rastiyan bi gelê me sist neke.

Lî ali dîn divê mirov ceħda pêşverû û demokratên Tirk yê nî vi wari da jî yê nî demokratî. Em, dîzanî yê nî ku gelê Kurd dî bin tedayê da dihêle, zordestî û kedxwarî dîke ne gelê Tirk e. Û em, jî berê va dibêjin ku herdu gel dikarin dî şertên aşî da lî kêleka hev bijîn. Lê kes nikare vê rastîyê bavêje pişt guhan ku ev tîşt her bî hoyên wekhevi mumkun e.

Wek ku me dî şaxên ewl yê nîvisê da jî da xuyakirî demokratên Tirk dî dema bori da derheq pîrsgrêka netewa Kurd da imtihanek baş nedan, iro jî ev qelsî dî dereceke mezûn da dajo. Qet nebe jî nîha pêva eger ew xwe jî bin bandora şovenîzmê xilaskî, ne bî çavên kolonyalistan bî çavekî demokratî lî tekoşîna rîzgarîya gelê Kurd binhêrî em ê bî vîya kêfxweş bî-

bin. Ev tewrê hanê tenê bî kêrî gelê Kurd nayê, dî eynî wextê da bî kêrî gelê Tirk, ku ew jî dî bin tedayê da ne, tê. Em tîm dibêjin lê em carek dî jî ducar bikî: Tekoşîna demokrasîyê yekpare ye; parastînek yek alî û neditîna aliyê dîm mirov naghîne çikî û bibê nebê bedêlek vê tekoşînê heye. Heta ev bedêl neyê dayî tî kes nikare biguhê mafên demokratî û azadîyê. Azadî jî alî dijminan va wek şabaşekê nayê pêşkêşkirî. Eger xeteke rast neyê girtî û jî acîzkirîna "dorhêlên hessas" bête tîrsandî, dî demên duwerojê da jî gava bî pipîkek hemû maf û azadî jî holê bê rakirî mirov nikare pêşîyê bigre. Wek 12'ê Îlonê. Heta lî Tirkîyê siyaseta zulma netewî bajo, divê mirov vê rastîyê navêje pişt guhê xwe ku gelê Tirk jî wê ne azad be. Yê nî ku doza Tirkên nîzamanê kêderê bikî, lî hember dewleta xwe û qirkirîna neteweyêke mezûn û gelên dîm bêdeng bîminî, eşkere ye ku kes bawerîya xwe bî dîlsoziya wana nayne. Ew bî van kiryarên xwe zirarê dîgîhînin tekoşîna demokrasîyê. Roj, ew roje ku hemû hêzên demokrasîyê, parêzkarên mafê bîgehî û azadîyan lî dij zordestîya faşî hêzên xwe bigîhînin hev, refên xwe qewî bikî. Û tekoşîn her bî vê hawê dikare bî serkeve.

ÇEND NÛÇE JI KURDISTAN

Ji roja ku cunta faşî hatiye ser hukîm heta iro, barbarî û bêşerefiya wî jî despotîzma Çar jî, Musolonî û Hitler jî derbas kirîye. Dijmîn bî hovîtiyek neditî, bî ordîya xwe ya rêzkirî, bî ajan û prowakatorên xwe êrişî gelê me yê destvala û bê parastî dîke. Girtî, kuştî, eşkence û zîndan tîr nake, serda jî bî darê zorê jî gundiyanê Kurd "parêzkarên gund" pêk tîne û bî vî hawê dî navbera insanên me da dijminatîyê kûr dîke, eşîran tîne hember hev û insanên me bî hev dîde kuştî; dî bin navê operasyona "terorîstan" da jî xeynî parêzkarên gund, gundiyanê dî jî dîdîm pêşîya xwe û wan dîkîm mertal jî kuştî ra; bî zorê dîkevin malê xelkê xwarî-vexwarî çî hebe paqî dîkî û serda jî çandîniyê qedexê dîkî. Lî kuderê nijadperest, zalîm û ruşwetxwarek hebe, wana dîşînin Kurdistanê, fermandari dîkîm destê wan Van rezîlan ku xwîna wan nake pênc pere, lî hember gelê me yê destvala û bê parastî, dî bin şîya cunta faşî û piştîgîriya wî da dezge û qanûnên kêfî saz dîkî. Bî kurtî iro dî Kurdistanê da jendîrme, polêz, ajan û hwd. lî gor kêfa xwe çî rezîlî bêjî dîkî. Jî 12 Îlonê

ûr da kê mî Kurd heye ku eşkence, girtî û tîda neditîbe.

Muslim Yaxmûr wek mertal dîdîm pêşîya xwe û dîkîjî

Muslim xortekî 20 salî ye. Piştî mirîna bavê wî aborîya malê dîkeve stûyê wî. Ew roj lî ser xwarîna nivro ne, gurme-gurme bî derî dîkeve û bî vekirîna derî ra 15-20 jendîrme dîkevin hundur û malê ser û bin dîkî. Piştî gerîna malê, fermandarê qereqola Hozatê Orhan Keskin, Muslim û apê wî Ozgur dîdîde pêşîya xwe û bî darê zorê wan dîbe operasyonê. Piştî ku jî gund dertên qedere saetek rê dimeşî. Dî tangeke çîya da rastî çend kesan tîn û dî navbera wan û çendîrman da şer çêdîbe. Şer bî qasî 10-15 deqge dajo û wan kesan demekî wînda dîbin. Ser vê yekê Astubay Orhan Keskin bî zorê Muslim û apê wî dîde pêşîya xwe û wan dîke mertal. Her çîqas Muslim û apê wî dibên "em bê çek in, sîceki me jî tune. Em ê bî kuştî",

gotinên wan pere nakin û bî darê zore atkevin pêşiya jendurman. Demek şunda car dîn rasti wan kesan dibin û gullebaranek dest pê dike. Muslim û apê wi di navbera du agran da dimînin. Demek şunda ji wan kesana keçîkek teslimbûna xwe diyar dike, lê ast. Orhan fermana gullekirinê dide û guh nade teslimbûna keçîkê. Keçîk hema wê gavê kuştin û pêra ji Muslim û apê wi tîn gullebaranînin. Apê Muslim bi çî kul û halî xwe davê rexê jendîrmeki û Muslim ji xwe davê çem, lê Ast. Orhan ji 15-20 gav dîr va Muslim û apê wi dide ber gulla. Apê Muslim ji çimê xwe birindar dibe, Muslim ji hema li wê derê can dide.

Ev bûyer di radyoya Tirkîna da weha hate êlankirin: " Muslim Yaxmûr ji alî 'teroristan' hate kuştin". Lê rasti ne ev e. Muslim bî destê Orhan Keskin hate kuştin. Apê Muslim rastiya vê bûyerê di kovara İkbîne Dogru da eşkere kir.

" Jî qereqolê gulle beri me dan"

Hediye, Qedriye, Fadime, Emine û Nadîre li ber kaniyê ketine suhbetê. Kani bî qasî 200 m. jî qereqolê dîr e. Nişkava dengê silahan tê bihistin û bî dengê silahan suhbeta ser kaniyê dibe şin û ava kaniyê ji xwina Nadîre û Hediye sor dibe.

Ev bûyer li Dersimê li nehiya Tuluk (sutluce) çê dibe. Hemû qizên ser kaniyê jî, kesên li wê derdorê ji dibinin ku jendîrme bî qestî û kêfî nişana koma qizan digrin û gullebaran dikin. Ew roj 1'ê Gulanê bûye!

Piştî vê bûyerê astatsubay Rafet Barış dibê "qeza bû". Waliyê Dersimê ji weha dibêje, "dî nobedariyê da nişkava silah bî xwe diteqe û ev qeza çêdibe."


Eşkere ye ku êdî nikarin vê sîcê bîkin stûyê kesî, îca navê "qeza" lê datînin. Nadîre ji rojnamevanan ra weha dibêje, "jî qereqolê gulle beri me dan û bî qestî berdan". Gundîyekî weha dibêje, "kêfî berdan". Rasti ji ew e ku him bî kêfî him jî bî qestî berdane.

Waliyê nijadperest dî bin navê

"parastina gel" da riya jiyane dibire

Wali Kenan Güven dî mîntîqa Dersimê da şerê lan kirîye û gelê Kurd jî dijîmîna dibîne. Ji ber vê yekê çî barbarî û bê şerêfî hebe ji aliyê waliyê nijadperest va tê ceribandin û kirin. Gelê Dersimê jî alî parastinê va dî xeterek mezîna da ye û riya jiyane li wan qedexa bûye. Wali dî 11.7.1986'an da fermaneki dide û daxuyaniya

fermanê dî hopelorên Dersim û qezayên wi da tê xwendin. Li gor "fermanê":



"Gere êvaran kes jî mala xwe derneyê û li zeviyan negere", "gere kes li holê jî negere (çî bî roj çî bî şev)", "rêyên kurtebir nexebitine", "dî rêveçûnê da ne bêdeng bin", "gava rasti mîfrezê (jendîrme) bîn bêyî ku bal bê kışandin bisekinin, li der û dora xwe mêze nekin", "dî destên xwe da dar yan jî tiştên ku derûvê tîfingê pê dikeve negerinin" û wd....

Lî gundê Guzelgozê barbarî

Dî 9'ê Nisanê (1987) da leşkerê ordiya faşî digre ser gundê Guzelgozê (Mêrdin), gund ser û bin dikin û 12 kes digrin dibin, Du roj ser hev li van 12 kesan êşkence tê kirin. Piştî du rojan car dîn davên ser gund jin, mêr, zarok hemû gundiyan li meydana gund diwînin û hemûyan jî êşkencê derbas dikin. Zîlameki tazi dikin û bî darê zorê bî jinan didin temaşekirin. Jî bîli vana li zarokan jî êşkence dikin, elektrik didin devê zarokan heta ku xwîn vedreşin.

Fermandarê leşkeran Aytekin İçmez bûye. İddiaya vi nijadperesti jî ev e, "gundi xwarin dî dîn teroristan". Ev bûyer dî rojnamên burjuvaziyê da jî eşkere bû û heyetek jî SHP'ê hate vi gundi jî bo lêkolandina vê bûyerê. Li gor lêkolîna SHP'yê, ne tenê li vê gundê, li gundên Ermûn, Binkelp, Pepar, Hermiş û hemû gundên dorhêlê ev êşkence civati tê kirin, tê bî karandin.



LECA DENG BÊJ KEREM Û DENG BÊJ XANÊ

Xanê, mala wê li Sîbhana jêrin, qîza Bekirê Aqo bû. Ez ji çûm wîra cîmaet tîji bû, min distira. Min nihêri kaleki pişt sobê rabû go: "Xorto!" Min go: "Çi ye?" Go: "Helala xwedê li min heram be, qîzeka min heye, navê wê Xanê ye. Ezê te û Xanê berdime hev. Te qîza min bend kir, wellahi tu çî bixwazi ezê bîdime te. Qîza min ji tu bend kiri, çî xwest tê bîdi?" Wey, min go, "ser çavê min. Malê min tune, hema herçar kîlamê min:"

Ya kelemek tûj
Ya berek mehûj
Kerem, Xanê têkne qûje-qûj.

Em çûn mala bavê wê rûniştin. Min nihêrî yeke du sing, mêkutek ani li wîra perde vekir. "Yaho" min go "ev çî ye?" Go: "Welle keçik dibê ez şerm dikim, ezê li pişt perdê bistirê." Min go: "Vîra dîke, herge şair e, bila derkeve meydana" Ûsa neyê li pişt deri guhdari dîke. Min di hema kete hundir, eva kember, fino, çotikê berê, kurtikê berê lê ye. Destê xwe da min go: "Xorto, merheba!" Min go: "Merheba" Go: "Te dînya herimandiye, ezê te berdîm!" Min go: "Vîra meke, meydana xwe tîji bixwaze!" Xwedê va eyan e, temam ji rûniştine; Eli Paşayê Eyib Axa, Eli Dûmlû wana gî rûniştine, gîregîrekê Keçela nîn, Bîlîxka nîn. Min go: "Xanê?" Go: "Çi ye?" Min go: "Em bî kîlama bîn hevdu, yan bî şairî?" Go: "Na, hema ez Gulê, tu ji Evdal." (1) De wê çend benda bêjine hev, cîka ji hev ra çî dibêjin:

Xanê go:

Brayê Keremo, ne li hatinê,
ne li çûyinê,
Ne li hatinê, ne li çûyinê,
Te çîma dilê me kîre gola xwinê?
Gunê min stuyê bavê te be, min
ji bîra meke,
Were yek seriya li mala me runê.

Kerem go:

Lê - lê Xanê,
Çevreşê çawişa bûkanê,
Binbaşiya qîzanê,
Gula dewata, şahiya govendanê,
Te ez kuştîm ji bo ramisanekê,
xwina min kanê?

Xanê go:

Brayê Keremo, şewitîyê gundê me
bî avrêje,
Hate mala me Keremê dengbêje,
Meriv bî du kîlama nîkare xelqê
bîrevine,
Tu du reisa bîşine, bila bê
qelînê min bibêje.

Kerem go:

Xanê, şewitîyê Sîbhanê bişewite
bî heze,
Qîrê li vî welati girt merkeze,
Ce, genim tev diheje,
Belkê Xanê bîve bûk, ez ji
zavayê teze.

Xanê go:

Brayê Keremo, şewitiyê Sibhanê
lî tepeye,
Mın hay jî barûta te heye,
Ev giliyê ku tu dibêji jî devê te
û bavê te zêdeye,
Xwe rakışine, teze dor dora mın
û teye.

Kerem go:

Xanê, şewitiyê Sibhanê bî kevirê,
Sıra sibê, bayê Helecê jê digire,
Ez dikim Xanê birevinim,
Deftera mın a nifûs koçaniya mın
jê nagire,
Belkê bavê Xanê bımire.

Xanê go:

Brayê Keremo, çevê reş lî ademine
Biri ser ra sêwincine,
Tu jî dūr va lêvê xwe nemirçine,
Zehf dıranê xwe neşidine,
Ra sıktır be, devê te van sûreta
nabine!

Kerem go:

Xanê, diwana hanê muhtebere,
Serê me qal û çeng û sefere,
Mêrkê şair ewledê pêxemberê,
Navê şairiyê lî sere,
Singê wi deftere,
Vekiriye lî bere,
Tu wan qaida berde, bî qaidê
maqûl jî jor da were.

Xanê go:

Brayê Keremo, navê mın Xanê,
Mın hafa newala lî Qaqızmanê,
Tu bûyi mışirê Ezirganê,
Serê xwe bilind ke, mêze ke
lî Sipanê,
Ezê kılamê Kerem bavême
koşê dikanê,
Niha çipa bigrım kaşkime meydanê.

Kerem go:

Xanê mın lî hafa Elaşgırê

lî Xaylazê,

Pivaz hatın ber kirazê,
Ezê xwe bî qurbana diya Xanê kım,
Ciyê me lî bêderê dayne,
Kerem xêra bavê tev razê.

Xanê go:

Brayê Keremo, mala bavê mın ciyê
textan û bexta,
Ezê ûsa beri te bıdım, tu yêra
xwe çêki rebê jorin tevekê hefta,
Ra sıktır be, tu devê xwe dirêj
meke mina devê exta!

Kerem go:

Lê - lê Xanê, şewitiyê Sibhanê
bıla bişewite lî serê siwisê
heft newala,
Bile cımaet bala xwe bide me
canık-camêr û herd hevala,
Em heft şev, heft roja bî
hev ra bêjin,
Tê niha bımını serqot û piştevala
Emê têkevıne kêf, henek û gale-
gala,
İcar tê rûreş heri nav hevala.

Xanê go:

Brayê Keremo, derê mala me bî
lavlake,
Kêlingê hilde dı ser ra gavke,
Devê xwe berhevke,
Ew giliyê ku tu jî mın ra dibêji,
Bavê minê te sirgûn talan ke.

Kerem go:

Xanê, bayê Sibhanê gure-gure,
Gazi melê gund kın, belkê mara
mın Xanê tevhev bıbire,
Yek Xanê destkêş ke, cıka kel e,
yan kure,
Bıla paşê jî hev nefire,
Kerem rast bêje, dewsa Xanê
temam vire.

Xanê go:

Brayê Keremo, gelo pêşiya hêşiyê
tolemeye,

Derê mala me hewş û xirbeye,
 Ev giliyê tu dibêji jî devê te û
 bavê te zêdeye,
 Eva çar seet in ez dibêjim,
 Teze xwe rakîşîne dor dora mîn û
 teye.

Kerem go:

Xanê, şewitîyê Sîbhanê diketim,
 pêçiya mîn diêşi lûbe-lûbe,
 Tu rabe ciya dayne bila zû be,
 Tek carekê devê mîn lî xala rû be
 Bîle lî vîra nebe, ciki dûr be,
 Gunê mîn lî stüyê bavê te be.

Xanê go:

Brayê Keremo, hiva gundê me
 minani çar çîra,
 Yek seriya lê xe were vîra,
 Jî mîn ra bêxe xwişkê, ez jî
 te ra bêjim bîra,
 Gundê me şeytan e, hêl çû ava,
 serbest tu lê xe were vîra.

Kerem go:

Xanê, şewitîyê Sîbhanê bî saze,
 Lê par biye refek quling, cote
 qaze,
 Ezê xwe bavêm taldê axeler û
 maqûla,
 Bila vê porkurê jî mîn ra
 bixwaze,
 Xanê dil dîke, bavê wê çîma ûsa
 bî naze?

Xanê go:

Brayê Keremo, malê me danîne lî
 yane,
 Devê te devê dinane,
 Ra siktîr be, ezê te tîxme
 kerê serginane!

Kerem go:

Xanê, şewitîyê Sîbhanê lî dibûri
 Lê digere îza nêçîrvana, dewsa
 mûri,

Em heft şev, heft roja bî hev ra
 bêjin,
 Tê nîha bîbî bîzîn, Kerem bîbe
 nêri, bî hev bûri.

Xanê go:

brayê Keremo, şewitîyê gundê me
 cot kanîne,
 Bav-brayê mîn rûnîştîne,
 Meriv zehf kevîra lî canîka
 naxîne,
 Ez xwişka te me, mîn bîbaxşîne,
 Karê mîn bî te tunîne.

Kerem go:

Xanê, meydan bî dar û bine,
 Bila bavê te porê te kur ke,
 dîzgina te hîlkîşîne,
 Xanê çifteke lî bavê xwe xe,
 herd diranê pêşîn bîfirîne.
 Evê ferhê da Xanê eşeda xwe tîne,
 Dêlê dadîgerîne.

Wey-la lê Xanê,
 Wexteki Îşmailê Hemze xwest,
 girt danê,
 Xwe jî Îsmail da berdanê,
 Îcar dane Eliyê Mihe Boxe lî
 Meşarê,
 Xwe jî Eli jî da berdanê,
 Paşê dane Qadîrê Reş Ortekendê
 jî Gêloyî,
 Rokê Qadîr hate Bazîdê,
 Şasîn, Elo, Şero va ûsa danê,
 Qadîr xwe rakîşînd da dera hanê..

- 1) *Gula Wetê û Evdalê Zeynîkê di nêzkaye dawiya sedşala 19'a da ketîbûne lecê.
 Ev leca Kerem û Xanê di dema keç û xortanî ya wan da qewimîye. Ew bî xwe hê dijîna î emrê wan lî dor şêst salî ye.
 Evê lecê Xanê jî bî teherê xwe disêwîrîne.*

çend çarin

BARAN

Bînêr jî hev dîzê tîm, mîrîn û jîyan
Hêvi aj dîde lî ser axa derd û kulan
Axa hîşk da dîmîrîn dîlopên pêşin
Yê dîn dîherîkîn, dîbîn ava çeman

* * *

Kar bî heval û hogîran şîrîn e
Ne be dara tenê, darîstan be
Jîna te îro heyê sîbê tîne
Dar dîmre, darîstan dîjî û dîçe

* * *

Şaxdarê got, xwezi ez bî serê xwe bama
Xwedi kok û fêki û naveki xweser bama
Jî darê qetîya, lê rîçal za bûn û pel çûn
Darê lî ciyê wê dû-sê ajên teze da

* * *

Dî vi şerî da ha leşker ha qumandar bî
Ku ava çem î, ha ya jorî, ha ya jêr bî
Hevalo, aqlê te kême, hêrsa te bîlînd
Wek guniyek çavê xwe lî ciyê spîndar bî

* * *

Derkeve bazarê canbaz hene, canbêzar hene
Zana tek û tûk î, dîn û nezan bî hezar hene
Her texlit mal tê fîrotîn lî wîr
Heval, gora te jî bom û bêzar hene

* * *

Ev leca bî gîligot û qîrîn ba eger
Rovî dîbû serok, ker dîbû rêber
Ka kî singê xwe dîgîhîne bênd?
Ne lî sêrî, tu lî dawî bînêr

* * *

JACK LONDON

(1876 - 1916)



Ev niviskarê mezin yê Emrikani sala 1876'an da li San Francisco ji dayika xwe bûye. Zarotiya wi di nav xızani da derbas dibe. Piştî deh saliya xwe dest bi xwendina hemû cûre pirtûkan dîke. Dî şanzde saliya xwe da dîkeve jiyaneke tolazi û bi qasî du salan ev jiyana nebaş didomine, lê di hijde saliya xwe da têdîgihije ku dawiya tolazi-yê tune û dest ji vê jiyana nebaş dîkşine. Ji vê demê pêva dest bi xwendinek bê westan dîke û di vê navberê da fikr û ramanên sosyalizmê nas-dîke.

Jack London di sala 1895'an da dîkeve Zanîngeha Kaliforniya, lê mîxabin saleki şunda ji ber sedemên abori û aborandina dê û bavê xwe ji zanîngehê vedîqete. Dî sala 1896'an da li nav-ça Alaskayê li bajarê Klondike zêr têtîtin. Ev bûyer wê demê bandoreke mezin li ser gelê Emrikani peyda dîke û her wisa J.London ji dîkeve karwana lêgerinvanê zêr. Bi vi awayî çend salên wi li hêla Klondikê derbas dibe. Dî wi hêla ku erdên rût û tebiyeteke hûşk jiyane bêçare dî-kir, romannivîsê mezin berhema xwe yê ewil, ku bi milyonan hate firotin, peyda kir û bi navê "Banga Hovitiyê" weşand. Naveroka vê pirtûkê

serboriya J.London û jiyana hûşk ya Klondikê ye.

Gava mirov li jiyana serboriya J.London hûr dibe, mirov rastî cehdeke wisa xurt û bi rîk dibe ku ev rewş di eserên wi da jî gelek eşkere xuya ye. Niviskarê granbuha, ji bo gihandina xwe, tûjkirina pênûsa xwe piraniya jiyana xwe bi xwendin û lêkolînê derbas kiriye. Babeta lêkolîna wi bi taybetî eşkerekirina jiyana insanî; rû-reşkirina zulm û niheqiyê ye. Bê guman wextê J.London li dîji niheqiyê, dîji barbariya dewle-mendan dertê, ku ev rewş di hemû berhemên wi da bi awakî eşkere xuya ye, wek çinayeti di refên karker, gundi û mirovên jar da ciyê xwe digre.

Aliyê London yê herî balkêş ew e, ku xwedi ramanên gelek vekirî û fireh, xwedi pêşaniyek xurt û raste-rast e. Irving Stone di romana xwe ya biyografîk ya derheq jiyana J. London da ("Serpêhatiya Behran") weha dibêje: "London li hember rastiyê evindariyek di dilê xwe da sehdkir, fikrandinek wi yê raste-rast heye, zanina wi qewî ye, şrovekirina wi yê derheq mirovatîyê afrandina zanînek kûr û xurt e. Ji bîli vana, fikrên xwe bi mîrxasiyek mezin datîne

holê. Hemû ev dewlemendiya fikri gava bi pêşandinek xweşik va dîgihije hev, berhema ku dertê holê afirandinek giranbuha û xebatek zan-yari peyda dibe." **L1** ciyek din ji, **Irving Stone** weha domduke: "Almên ku li ser ramanên J. London bandor peydakirine Darwin, Spencer, Marx û weki din in. Felsefa London raste-rast dîgihije çavkaniya van herçar zanyarên pêşevan. Di dema salên 1899'an da, dijayeti û êrişek mezim di hate ser fikrên van niviskaran, hetta xwendina berhemên wan zanyaran mîrxasi dixwest û berhemên wan wek xeter di hate nişandin (ji alî dewletê va). Ji xeynî vana ji bo fêrbûn û têgihîştina berhemên Darwin yan ji yê Marx feraset û jiriyek xurt pêwîst bû. Di J.London da ev herdu feraset ji hebû. Jackê ku mîrxasiya xwe bi jiriyê xwe va keland, jiyan û felsefa xwe bi fikr û felsefa van mirovên zanyar bi serfirazi xemilandibû. Di dilê wî da şikên ser-wext hêşin dibû, di oxira gihîştina rastiyê da evindariyek rasteqîn di dilê xwe da sehdkir. Bir û baweriyên nû, fikrên negatîf yê ku rihê wî berbi tariyê va kaşdikirin ji holê radikir, ji bo beşdarbûna dinya zaninê rêyek îlmî lê vedikur."

J. London bi afirandinên xwe di sala 1913 da giha merheleyek wisa bilind, ku di dinê da zêtirin pirtûkên wî dihatin xwendin û çapkirin. Lê mîxabin ev niviskarê mezim mîrxas, parêzkarê bîndestan jiyanek kurt jiya û di 40 saliya xwe da bi xwekuştinê ji refên hunermendan qetiya çû. Dema ku jiyan wî bi xwekuştinê hate qutkirin, li dû wî nêzi 50 berhem ma. Çend berhemên wî yê sereke ev in: "Banga Hovitiyê", "Martin Eden (1909)", "Banga Daristanê (1909)", "Hezkirina Jiyanê (1907)", "Pehniya Hesni (1907)", "Çirokên Behra Başur (1911)", "Serhildana Elsinorê (1914)", "Xanûma Biçûk Ya Mala Mezin (1916)", "Berxwedan", "Agirkirin", "Mirovên Geli" û gelek bermayiyên din.

Jack London bi romana xwe yê bi navê "Pehniya Hesni" di nav niviskariya çîna karkeran da ciyek payebilind girtiye. Di destpêka 1900'i da xebata karkeran gihabû merheleyek bilind û hewcedari ji niviskareki karkeran ra hebû. Bersiya vê pîrgirêkê tenê J.London da û bi berhema "Pehniya Hesni" mîrxasi û pêşevaniya xwe eşkere kir.

Ev roman iro ji wek klasîkek sosyalist tê heb-sibandin, lewra di vê pirtûkê da rexneyên giran li kapitalîzmê tê kirin. Qehremanê vê romanê Ernest Ewerhard, dji sistema kapitalist rexneyên giran dike û ji bo hilweşandina sazûmana kapitalîstên zorker di nav refên karker, belengaz û jaran da kar û xebatek rêxistinî saz dike û pêşengiya vê karê dike. Ernest Ewerhard bi cesareta xwe, zanebûna xwe, bi bir û baweriyên

xwe yê pêşverû û dîrditi tê idealîzekirin. Ku Ewerhard ji alî keça J.L. - Joan London va weha tê şîrovekirin, ".....Ew tipê şoreşger ku J.London dixwest bibe wek wî" ye qehremanê romanê.

Di beşek romanê da, Ernest bi riya profesore Fîzîkê - John Cunningham beşdari şaiyîk sermîyandaran dibe û di vê şaiyîyê da munaqeseyek di navbera Ernest Ewerhard û sermîyandaran da çêdibe:

Ernest dest bi pêşandina ordiya şoreşê kir. Hejmarên ku qeweta ordiyê nişan dide (rayên ku li cûre-cûre welatan hatine xebitandin), da. Rûyê guhdaran kuşiyabû, lêvên wan reng û rûçik lê nemabû. Di dawiyê da şûr hatibû kışandin, lepik hatibû avêtin. Lec destpêkir. Ernest behsa rêxistinên navnetewî yê sosyalist kir, milyon û nivê Emrikayê, bist û pênc milyonê welatên dinê yê mayî, gotê.

"Bî vi awayî ordiyek şoreşê," digot, "qewetek ku bist û pênc milyon e, bangî serkaran û çîna serkaran dike ku rawestin û bifikirin. Slogana vê ordiyê weha ye: 'Ne hûnek, em hemûyan dixwazin! Hemû tiştên ku yê we ne dixwazin. Hindiktirê wi ra em ê qet qîma xwe neynin. Em dixwazin hevсарê qedera iqtidarê û miroviyê bikin destên xwe. Tam li vê derê, di lepên xwe da dixwazin. Vaye destên me. Vana destên bî huner in. Em ê qesr û xweşiya we ji destê we derxin. Hûnê ji herin, wek gundiye zeviya, wek karkerên xîzan yê qerexê şarên we ji bo ku nemirin, eynî wek wan hûnê bixebitin. Vaye destê me! Van destan, destên bî huner!'"

Di eynî beşî da, li ciki din ji weha diaxufe:

"Min dit ku mirov çawa ji dil bawerîya xwe dide hev, biranina mirovên din hîsek çawa ye. Min, minaka fidakariyê yê herî baş, melekên xweşiktrîn di nav şoreşgeran da dit. Di dinya wan da jiyan paqûj, bî rûmet û bî can bû. Ez bî rihên mezim yê ku xwin û canê xwe raseri dolaran û sentan digirtin ra hevnesiyam. Ew ne bi pêşketina bazirganiya împaratoriya dinê ra, bî zarokê şarê qerex ra, yê ku ji birçibûnê ketibû halê mirinê, ji dil mijûl dibûn. Dêrdora min, bî rihên xweşik yê ku ji bo armancên bî rûmet bî qehremani dixebitin tji bû; rojên min şevên min, tav û stêrk, agir û xusar bû, xusarê teze. Li ber çavê min Kaseya Pirozkiri yê çûrisandî, Kaseya Îsa, jankêş, êşkencekêş, lê di dawiyê da kaseya mirovê ku hate parastin û rizgar bû alav alav diçûnsî."



ZAROK

DU HEVAL

Leo TOLSTOY

Rojekê du heval dî dibîstanê da geriyane. Carekê jî nişkava hırçek derketiye pêşiya wan.

Yek jî wan herdu hevalan çîlpask kiriyê û jî wir reviyaye. Bî darekê va hîlpask-bûye, derketiye jorê û xwe dî nav pelên darê da veşartiye.

Hevalê dîm jî lî wir, lî wê rastê, lî ser rê maye. Çî bike? Çî dikare bike? Wi jî hema xwe deverû lî erdê dirêj kiriyê. Xwe lî mîrnê avêtiye. Hîrç hatiye hatiye nêziki wi bûye, vi ali wi ali ew bêhnkiriyê. Wi jî qet deng dernexistiye. Wi bêhna xwe girtiye ku qet fişe-fişê jê nayê.

Hîrçê serçavê wi mirovi bêhn kiriyê, wîsa bawer kiriyê ku ew muriye. Hîrçê ew hîştiye û çûye.

Paşê ku hîrç jî wir çûye, ew hevalê lî ser darê daketiye xwarê. Keniyaye û jî hevalê xwe pîrsiye:

"Hela bêje hîrçê çî dî guhê te da got?"

"Got hevalê ku te dî talûkê , dî rojên teng da dihêle û direve, xwe jî wi hevalî bîparêze."

Wîsa gotiye û bî rê ketiye û çûye.

FIL

Wextekê lî Hindîstanê mirovek û filekî wi mirovi hebûye. Vi mirovê han, fila xwe şev û roj daye xebitandî, lê zîkê wi jî tucar baş têr nekiriyê.

Rojekê fil lî xwediye xwe pîr hêrs bûye, ew avêtiye binê piyên xwe û hîncîrandiye.





Ew mirov li wir muriye.


Jina wi pîr griyaye. Bî şin û grin destê zarokên xwe girtiye aniye û avêtiye ber lingên filê.

"Ey fil," gotiye "te canê bavê van zarokan stand, ha ji te ra canê wan ji bisti-ne bila xilas bin."




Fil weha li zarokan nihêriye, paşê xortima xwe li piştê lawikê herî mezîn alandiye û ew hildaye daniye ser stûyê xwe. Qet ew neşandiye.

Fil ji wê rojê şunda êdî qet ji gotîna lawik derneketiye, hergav ji bo wan xe-btiye.

XAÇEPIRS



		2			3
1	D				K
	E				I°
4	B	I°	R	6	
		R		5	E
				U	O
				R	S
					K
		8			
	9	7	Ş	Ê	R
					U
					V
10	J	U	J	I°	





Keça Kurd, têkoşera qehreman LEYLA QASIM, 13 sal berê dî 5'ê Gulanê 1974 'an da lî Bexdayê, bî destê rejîma baasi ya xwînxwar hat dardakirin.

Leyla Qasim û hevalên wê, lî Bexdayê, bî gelek xebatên eskerî yê serfiraz piştgiri didane tevgera rîzgariya gelê me ku wê demê bî şerê germ dom dîkir. Cara dawiyê, wê û hevalên wê wek Hesên, Cewad, Azad û Neriman xwestin sinemayeke baasi (ku xusûsi jî bo gîre-gîrên baasi-

yan bû) bî bombe hilweşînin. Lê plana wan eşkere bû û ketin destê dijmin.

Leyla Qasim dî riya rîzgariya gelê Kurd da tevi rêza şehîdên me bû û bû sembolek jî bo hemû keç û jinên Kurd ku lî gel bav bira û mênên xwe, jî bo azadiyê şer dîkin.

Leyla û hemû şehîdên azadiyê dî têkoşîna rîzgariya gelê Kurd da dijîn. Gelê me wê wan jîbîr neke.

bı kurti...

* Roja 29 Gulanê lı Stokholmê ji bo protestokirina bombebaranên gaz û bikaranina çekên kimyevi ku diktatoriya xwinxwar ya Saddam pê êrişî ser gelê me dîke lı Kurdistanê Iraqê, meşek çêbû. Dî vê meşê da ku bî insiyatîfa Komîta Hevkariya Rêxistinên Kurdistanê hatibû çêkirin, nêzîki 1000 kesi beşdar bû.



* Roja lı Sokholmê ji aliyê hêzên dî-nîjadperestiyê meşek çê kirin. KOMKAR-Swêd ji bî bandro-la xwe dî vê meşê da cih girt.

* Roja 16-17 Gulanê ji aliyê APK (Partiya Karkerên Komunist) festivalek çê bû. KOMKAR-Swêd bî endamên xwe va têda beşdar bûn.

* Roja 19'ê Gulanê lı Stokholmê, ji aliyê Învandrarforvaltningen şayîyeke dostiyê ji bo biyaniyan hatibû amadekirin. Dî bernama vê şayîyê da, koma govendê ya KOMKAR-Swêd govendên kurdi pêşkêşkir. Herweha broşûreke agahdariyê lı ser Kurdistanê, ku KOMKAR'ê hazır kiribû, qasî 1500 heban hat belavkirin.



* Dî pirozkirina 1'ê Gulanê da KOMKAR-Swêd û AKSA bî hevra dî bî flamayeki da meşîyan. Dî vê meşê da van herdu komel bî tevayî belavokek bî zîmanê swêdî be-

* KOMKAR-Swêd dî roja 28.03.87'an da ji bo biranina 41. saliya Komara Mehabad cîwînek dar xist.

YEKÛTIYA MAMOSTEYÊN KURD LI SWÊD HAT DAMEZRANDIN

Dî çarê meha nisanê da, lı Stockholmê Yekûtiya Mamosteyên Kurd, kongra xweye damezrandinê pêkani. Dî vê kongrê da nêzîki 30 mamosteyên Kurd, ji her çar perçên Kurdistanê amade bûn. Bî awayeki demokratîk, pîrs û pîrsgrêkên dersdan û xwendina zîmanê kurdi lı Swêdê hat behskirin. Herweha projeya destûra Yekûtiyê ku ji aliyê Komîta Amadekar hatibû berhev kirin, bî hin guherinên swîk hate pejrandin. Paşê ev mamosteyên jêrin ji bo Komîta Karger hatin hîlbjartin:

- 1- Lutfî Baksî
- 2- Xoşmend Baran
- 3- Mueyed Teyîb
- 4- Aso Germiyani
- 5- Emir Qazî





BIHA: 10:— kr.